

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 84
Îlon
1988
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armanç

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 84
September
1988
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Di bin bombardûmanên çekên kîmyayî de Têkoşîn û berxwedan dom dike !

Pirraniya wan zarok, jin û pîr, bi hezaran Kurd derbasî Kurdistanê Tirkîyê û hejmarek mezin jî derbasî Kurdistanê Îranê bûn. Yên dikevin destê Iraqê, ya tîn kuştin yan jî xwe di kampan de dibînin.

Pêşmerge bi mêrxasî berxwedan û têkoşîna xwe didomîne, ji roja 19.7.1988'an heta 5.9.1988'an li herêma Behdînan 7000 leşkerên Iraqê hatin kuştin, bi hezaran leşker jî birîndar bûn.



Bi hezaran însan xwe li sînorê Kurdistanê Tirkîyê xistin

Êrişên diktatoriya Baas ser Kurdistanê ket meha sisiyan. Bi leşkerekî giran û bi çekên modern ordiyên Baasî şerê gelê Kurd dikin. Li gora xeberên ku ji herêma tîn, di şerê navbera leşkerên dij-

min û gelê Kurd de heya niha bi hezaran însan hatine kuştin.

Heta nuha nêzî 100 hezar xelkê sivil derbasî Kurdistanê Tirkîyê bûn. Hejmarek mezin jî ilticayê Îranê kirin. Xelkên li erdên rizgar-

kirî dijîn û îmkân ne-dîtin ku derkevin derveyî hudûdê Kurdistanê Iraqê, ji alî leşkerên Seddam ve yan hatin qetilkirin, yan jî di kampan de hatin hefskirin.

Dûmahîk r.11

Netîca referandumê:

Gel dersek baş da hukûmeta Ozal

Li Tirkîyê 64.3 prosent, li Kurdistanê 69.4 prosent li dij pêşniyara Ozal derket.

Ji bo hîlbijartinên meheli di 13'ê Çiriya Paşîn de bibe yan jî 4 meha bi şûn de bibe, Tirkîyê di 25'ê Îlonê de çû referandumê. Ji bo armançek piçûk, bê mane û xerîb hukûmeta Ozal xelk bir ser sandoqê. Di vê referandumê de armanca T. Ozal, hîlbijartinê di meha Çiriya Paşîn de bike. Ji bo hîn bêtir deng bistîne, Ozal, ev dem ji xwe re çêtir didit.

Muxalefeta burjuwazî di serî de SHP û DYP bi

Li Dêrsimê 34.6 prosent, li Diyarbekirê jî 18.5 prosent xelk yan neçûn ser sandoqan yan jî rayên vala avêtin.

propogandek xurt xwestin vê referandumê ji bo hukûmeta Ozal bikin îmtihanek. Di vê noxtêde jî bi serketin. Bi tesîra vê propogandayê Ozal xwe mecbûr dît, ku bêje "li gor netîca referandumê dibe ku ez îstîfa bikim û dev ji siyaseta berdîm".

Di dawîya hîlbijartinê de, pêşniyara Ozal %35'ê raya, dij-pêşniyara Ozal jî %65'ê rayan girt.

Dûmahîk r.11

Dinyayê Dîktatoriya Seddam Mahkûm Kir

Rêxistina 'Efûyê': "Rêjîma Iraqê siyaseta qirkirina Kurdan bi hawakî sistematîk, bi plan û bi zanbûn dimeşîne, ji bo ku beşekî Kurdan ê mezin bi carêk de ji ortê rake"

Parlamentoya Ewrûpa ya Ekonomîk: "Iraqê, ji bo ku Kurdan ji ortê rake çekên kîmyayî bi kar aniyê. Û ev jî ji îmhakirina miletekî pîr ne dûr e"

Ger hinekî bi derengî be jî cihanê rejîma Seddamê xwînmêj ji ber bikaranîna çekên kîmyayî li hember Kurdan, bi xurtî mahkûm kir; li dijî vê barbariyê reaksiyonek baş nîşan da.

Xaça Sor, Rêxistina Efûyê (Amnesty), Parlamentoya Koma Ewrûpa, Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Miletan Javier Perez de Cueller, Serokkomarê Fransa F.Mîterand, Hukûmeta Margaret Thatcher, Wezaretê Derva ya DAY û Wezaretê Derva ya Îsrail di beyanên dan de; êrişa Iraqê bi çekên kîmyayî li hember gelê Kurd bi hawakî sert protesto kirin. Bîrûraya cihanê (efkari-umûmiye) li hember vê êrişa Iraqê bi çekên kîmyayî wek dema Helepçe bi tevayî bê deng nema. Her

donzde dewletên endamê Koma Ewrûpa (EG) di beyana xwe de bala Iraqê kişandin û gotin. "Iraq, ji bo ku Kurdan ji ortê rake li hember bi hezaran kes çekên kîmyayî bi kartine û ev jî, ji qirkirina miletekî pîr ne dûr e." Li aliyê din daxwaza hin tedbiran, wek "Divê îxracata hemû sîleh û maddeyên kîmyayî ku dikarin di gazên herbê de bî bikaranîn neyên firotinê Iraqê, ji ser bî birîn."

Li aliyê din, Wezaretê Derva ya Îngîlistanê, Sefîrê Iraqê yê Londonê Sadîk M. El Masad dawetî wezaretxanê kir û li ser êrişa Iraqê bi çekên kîmyayî li hember Kurdan nerazibûna Hukûmeta M. Thatcher jê re got.

Dûmahîk r.11

Wahşeta Dîktatoriya Iraqê hate protestokirin

Di mitînga Wanê de şîara "Qatil Seddam" hat avêtin û piştgirî bi gelê Kurdistanê Iraqê re hat nîşandan. Di mitînga Sêrtê de jî ris-mên Seddam hat şewitandin û şîara "Bijî Biratiya Gelan" hat avêtin. Bi dehan kes jî alî polis ve hatin girtin.

Li Ewrûpayê jî li welatên ku Kurd lê hene wahşeta rejîma Iraqê bi xurtî, bi tevgeran hat protesto kirin.

Xebera wê di rûpela 2'an de



Polîs, li ber Konsolosxana Iraqê ya Stenbolê li meşvanan dixê.

Rojeva Mehê

Bawerî ji çekên kîmyayî jî xurttir e

Êrîş û feleketa ku dihat payin dawiya dawiyê hat serê gelê Kurd. Piştî rawestandina şerê navbera Îran û Iraqê, rejîma Aflaq a xwînrêj bi 160 hezar leşker, bi bombeyên jehrî û bi çekên kîmyayî êrîşek berfireh bir ser Kurdistanê; ser hêzên pêşmerge yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê, herêma Behdîna. Di vê êrîşa hov de leşkerên Iraqê 200 gund bi bombeyên jehrî û bi çekên kîmyayî ji bin de wêran kirin. Bi kêmasî pênc hezar kes (ku pîrrianiya wan bi çekên kîmyayî birindar in) birindar bûn û li dora du hezar kes jî şehîd ketin. Li alî din, nêzî sed hezar xelkê siwîl jî mecbûr man ku erd û avên xwe terk bikin û derbasî Kurdistanê Tirkîyê û Îranê bibin. Van reqemên jorîn jî çap û ciddiyeta êrîşê baş rê dide. Lê ne wê tenê, zêfî û qelsiya dîktatoriya Seddam jî îspat dike. Ji ber ku bikaranîna çekên kîmyayî li hember pêşmergeyan, îspat dike ku rejîma xwînrêj di warê leşkerî de nikare bi hêzên Kurdan, loma jî çekên kîmyayî bi kar tîne.

Ev êrîş jî bo tu hêzeke Kurd nebû surprîz. Ji ber, baş dihat zanîn Seddamê destbixwîn li Kurdan gelekî bi gef e, heger rojekê keysê bibîne wê bixwaze liberxwedana Kurdan îhma bike, ya jî bi kêmasî jî bo demekê qels bixîne. Ji xwe wî ev neta xwe eşkere digot, "Ezê mese-la Kurd him jî bo me û him jî ji bo cîranên me, ji bo carekê, lê ji binde hel bikim". Loma jî heta nuha gelek caran li hember hêzên Kurd çekên kîmyayî bi kar anîn, Helepçe wêran kirin, pênc hezar insan kuştin.

Fakt û zanînen berbiçav nişan didin ku haya Tirkîyê jî ve êrîşa Iraqê hebû. Û Tirkîyê bi netîca siyasetekê biryar dabû ku di dema êrîşa ordiya Iraqê de ger hin pêşmerge bixwazin derbasî Kurdistanê Tirkîyê bibin, Tirkîyê wê wan qebûl neke. Îspata vê jî, çend rojên pêşîn Tirkîyê nehîşt kes derbasî aliyê "Tirkîyê" bibe. Êrîşa Iraqê di 25'ê Tebaxê de dest pê kir, lê Tirkîyê sînor di 28'ê mehê de vekir, yanî 3 rojan, bi hezaran zarok, jin, kal û pîr li ber sînor girt. Piştî vê bi demekê cardin sînor girt. Li ser vê di 2'ê Îlonê de Mesût Barzanî beyan kir, got, "Heger Tirkîyê sînorên xwe veneke û van insanan negre hundur, emê Tirkîyê jî şirikê ve qetlîamê îlan bikin." Di vê nabênê de bi hezaran kesên siwîl, bi zor, xwe li sînor qelibandin û derbasî herêma Uludere, Çuqurca û Şemdinlî bûn. Di vê nuxtê de Tirkîyê li hember emirwaqiyekê bû, rewşa dewleta Tirk, Metîn Toker di quncikê xwe de xweş anî ziman; got, "Em ji rê derbas dibûn kevir bi serê me de ket. kevirê Kurikî". Rastî ev e, ne ku wek rojnameyên Tirk û rejîma Ozal propogande dikin ku Tirkîyê jî ber hin fikrên humanîter Kurd qebûl kir. Çimkî em baş dizanin dewleta Tirk li hember Kurdan tu carî nabe humanîst, tişteki wisa li dijî qerekerê dewleta Tirk e.

Tirkîyê mecbûr bû wan qebûl bike: yek, yê hatibûn pîrrianiya wan xelkê siwîl bûn; dudu, li hember wan çekên kîmyayî dihat bikaranîn û di rewşek wisa de li gor peymanên navnetewî mafê wan bû ku îltîcayî Tirkîyê bikin. Bê guman yê Tirkîyê mecbûr kir ne ev sebeb tenê bûn, hin faktorên din jî hebûn; wek hesabên siyasî di referandûm û di hilbijartina belediyan de û başkirina tîkiliyên bi Yekîtiya Ewropa re. Lê bi baweriya me, faktorê herî muhîm hebûn û xurtbûna muxalefeta Kurdan bû. Eger dîktatoriya Evren û Ozal multeciyan Kurd qebûl nekira, wê muxalefet û tîkoşîna gelê Kurd li Kurdistanê Tirkîyê tûjûr bikira. Û ev jî, ji bo wan xetereke gelek mezin e.

Rewşa multeciyan Kurd çî ye?

Di destpêkê de rojnameyên burjuwazî qereperek pîr mezin derxistin, gelekî pesnê Tirkîyê dan; gotin, "Bi pêşmergeyan re alîkariya insanî", "Hêviya Kurdan Tirkîyê", "Me ji kesên belengaz re himêza xwe vekir", "Deriyê me ji Barzanî re vekiriye" û h.w.d. Lê belê durrûtiya dîktatoriya pîr neajot, piştî heftakê dest pê kirin propogandeyek wulger û şoven li hember multeciyan meşandin. Gotin, "Me bela li serê xwe vekir",

Dûmahik r.11

Wahşeta Dîktatoriya Iraqê hate protestokirin

Bi hezaran malbatên Kurd jî ber êrîşa û tofana çekên kîmyayî bar kirin û xwe avêtin Kurdistanê Tirkîyê û Îranê. Li gor beyanên berpirsiyarên Tirkîyê û xeberên rojname û ajansan di ser 100 hezar kesî re derbasî Kurdistanê Tirkîyê bû û 70 hezar kes jî çûn Îranê. Bi maddî û manewî xelkê Kurdistanê Tirkîyê alîkariya xwişk û birê xwe yê Kurdistanê Iraqê kirin. Lê rejîma Evren û Ozal rê li ber vê alîkariyê girtin. Nehîştin millet bi xurtî alîkariyê bike. Di vî warî de parlementerên Kurd û Çepên ku di

Li Danîmarkayê Komîta Piştigiriya Kurdistanê li dijî êrîşê hov û qetlîamên Seddam belavokek belav kir. Li Kopenhagen mitîngêk organîze kirin û 200 kes çûn ber buroya Yekîtiya Miletan û ji wan daxwaz kirin ku bi kar anîna çekên kîmyayî li hember gelê Kurd divê bê sekinandin.

Di mitîng û meşa Londonê de di ser 1000 kesî re hazirbûn. Mitîng jî alî Cepha Kurdistanê Iraqê ve hat organîzekirin û di mitîngê de parlementerê Partiya Karkerî Îngilîstanê Jere-nay Corbyn axaftinek kir. Corbeyn di

Li Berlînê bîna Xaçê Sor hat îşxal kirin. Li bajarê Hamburgê li pîrrianiyan dezgên informasyonê hatin vekirin û ji hemû partî û rêxistin û organîzasyonên mafê insanî re ji bo ku li dijî barbariya Seddam tedbîra bîstînin bangê hat kirin û di 17'ê Îlonê de jî li dijî Iraqê meşek hat çêkirin.

Li Rojhilata Navîn bi navê "Tevgerên Netewî yê Rizgarîxwaz Seddam Protesto dikin" belavokek hat belav kirin. Belavoka ku partî û rêxistinên îmza xwe avêtine ev in: Partiya Komînîsta Lubnan, Partiya Komînîsta Mîsr, Partiya Komînîsta Urdir, Partiya Komînîsta Erebaştanê Scûdî, Partiya Komînîsta Sûriyê, Partiya Komînîsta Filîstîn, Cepheya Rizgariya Netewî ya Bahreyn, Cepheya Gelê Bahreyn, Koma Welatparêzên Mîsîrî li Dervayî Welat, Koma Demokratên Iraqê, Partiya Sosyalîst a Iraq, Cepheya Rizgariya Erître-Konseya Şoreşger, Cepha Rizgariya Gelê Erître, Cepha Rizgariya Gelê Filîstîn, Cepha Rizgariya Gelê Filîstîn- rêxistina Urdir, Cepha Demokratîk ji bo Rizgariya Filîstîn, Cepha Demokratîk ji bo Rizgariya Filîstîn-Rêxistina Urdir-El Mecc, Cepheya Rizgariya Gelê Ûman, Rizgarîxwazên Netewî yê Kurdistan- Baskê Sosyalîst û PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan). Van partî û rêxistin di beyana xwe de barbariya ku Rejîma BAAS li hember Kurda dimeşîne protesto kirin.

Li Norwêçê, Li Yunanîstanê, li Fransê û li Swîsrê bi gelek hawayî rejîma Seddam hat rûşekirin.



Bîstek ji meşa Stockholmê (Foto: Armanc)

nava Partiya SHP de ne yarmetiyek mezin dan Kurdan û rejîma Iraqê protesto kirin. Wexta parlementerên SHP yê Qersê Vedat Altûn û serokê SHP yê Stenbolê Ercan Karakaş tevî grûbek 60 kesî tacagula reş danin ber sefîretê Iraqê ya Stenbolê polis bi copan êrîşî wan kir û ew belav kirin. SHP di 6'ê Îlonê de li Wanê û di 8'ê Îlonê de jî li Sêrtê mitîng çêkir. Di mitînga Wanê de şîra "Qatil Seddam" hat avêtin û piştigirî bi gelê Kurdistanê Iraqê re hat nîşandan. Di mitînga Sêrtê de jî rîsmên Seddam hat şewtandin û şîra "Bijî Biratiya Gelan" hat avêtin. Bi dehan kes jî alî polis ve hatin girtin.

Li Ewropayê jî li welatên ku Kurd lê hene wahşeta rejîma Iraqê bi xurtî, bi tevgeran hat protesto kirin.

Li paytexta Swêdê di 1'ê Îlonê de 50 kes li ber xaniyê yekîtiya Miletan ketin grewa birçibûnê. Di roja pêncên grewa birçibûnê de Wezîrê derva yê Swêdê Sten Andersson got ku "Hukûmeta Swêd çî desta bê wê bike" li ser wan gotinan, grewa birçibûnê xelas bû. Di 10'ê Îlonê de jî Cepha Kurdistanê Iraqê, Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER), Komîta Rêxistinê Siyasî ên Kurd li Swêdê û Federasyona Kurd bi hev re li Stockholmê mitîngêk çêkirin. Di mitîngê de berpirsiyarên partiyên Swêdî yê ku di parlamentoyê de temsîl dibin û yê din jî amede bûn û yek bi yek axaftin. Di axaftinên xwe de wan rejîma Iraqê protesto kirin û piştigiriya xwe ji gelê Kurd ere anîn ziman. Di mitîngê de nêzî 2 hezar kesî hazir bû û heta ber sefereta Iraqê meşîyan.

axaftina xwe de bi hawekî sert rejîma Iraqê protesto kir.

Li Almanya Federal 14 partî û rêxistin û komelên demokratîk ên Kurdan bi hev re belavokek belav kirin.

Rojnamevanên Tirk çî gotin?

Hasan Pulur:Heger bes jî vî alî de li meselê bê nêrîn û bê gotin ku "Iraq ji van insanî çî dixwaze? Wê çaxê emê bi tarîxa xwe re jî tîkevin dijayetiye.(Millyet, 6.9. 1988)

Oktay Ekşi: Em tekrar dikin: xelaskirina van insanî jî qetlîama Iraqê wezîfeyek insanî ye. Lê belê, heger em naxwazin di dawiyê de belakê bînin serê xwe, hîn çaxa jî sînor dikevin hundur dibê ji wan re bê gotin, ku ewê karibin çiqasî li vir bimînin û teahutnameyek jî dibê ji wan bê girtin.(Hurriyet.12.9.1988).

Ugur Mumcu: Hukûmeta Iraqê li hember hêzên Barzanî û Talabanî, ku wan di dema şerê Îran û Iraqê de ji parre(paş ve) li leşkerên Iraqê xistibûn, dikare hereketek leşkerî bike. Ev meseleyek Iraqê ya hundur e.(Cumhuriyet, 10.9.1988).

Ergun Balci: Di demekê ku Iraq bi Îranê re di şer de bû pêşmergeyan di paş cephe de îşyan kirin û Iraq xistin rewşek xirab. Ku îro Iraq êrîşê bibe ser wan, tu kes nikare tîkil bibe.(Cumhuriyet 5.9.1988)

Metin Toker: Em ji rê derbas dibûn kevir bi serê me re ket "îşê Kurda". Mesele helbet îşê Iraqê ye hundir e... Nuha Iraq bi xwe, heger taswîpkirina wê zahmet be jî, bi usûlên xwe dixwaze wan (Kurdan) ceza bike. Nihayet daxwazek weha heqê Iraqê ye. (Millyet 6.9.1988)

Haluk Ulman: Ji ber ku wan di dema şerê Îran û Iraqê de li hember Iraqê bi Îranê re hevkarî kirin. Lema jî li gor rejîma Baxdadê, vana "Xayînen ku Iraq ji paş ve xençer kirine". Bi qebûlkirina wan, Tirkîyê dibê alîkarê kesên ku dixwazin benê Tirkîyê bikîşînin.(Hurriyet 5.9.1988)

Ertugrul Ozkok: Ev nêzî deh sala ye ku Iraq bi Îranê re di şer de ye. Û ji alî kî de jî mecbûr ma di hundur de bi Kurdan re şer bike. Tabî bi mexsedek wisa jî, ji îmhakirina bi hezaran insan nabe "sebebekî sivi-kayiyê". Lê cardin jî ku dema em serboriya xwe jî bigrin diqetê, gelo nabe ku meriv nebzekê Iraqê jî fahm bike. (Hurriyet, 5.9.1988)

Adresa : Armanc
P. Box: 6004
172 06 Sundbyberg / Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC
Telefax: ATTN ARMANC 46-8-208006

Ansvarigutgivare:
Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0348 7385



Nama TEVGER'ê Ji Sekreterê Netewên Yekbûyî re

Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER) li ser zilm û tadeyiyên ku li ser gelê Kurd tê kirin nameyek ji Sekreterê Netewên Yekbûyî re şand. TEVGER di nameya xwe de qala siyaseta dewletên mêtin-gehkar a li dij gelê Kurd dike û bi taybetî bala Sekreter dikşîne ser perçê Kurdistanê yê di bin nîrê Tirkîyê de û wiha dome dike:

"Dewleta Tirkîyê ku perçê mezintirîn ê Kurdistanê îşxal kiriye, li dijî gelê Kurd siyasetek şoven dimeşîne û bi vê jî namîne bi karîna bêjeyin "Kurd" û "Kurdistan" sûc qebûl dike. Guhdarkirina muzîka Kurdî, bi Kurdî axaftin û lêkirina navên Kurdî li zarokan, qedexe ye. mafê zarokên Kurdan tune ye ku bi zimanê dayika xwe bixwînin. Navê bajar û gundên Kurdistanê û navên hin herêmên Kurdistanê dugeherin, navên Tirkî lê dikin.

Nama TEVGER'ê, bi qalkirina bi rêvebirina gelê Kurd û Kurdistanê û hin qanûnên taybetî ku bi taybetî ji bo bi rêvebirina gelê Kurd û Kurdistanê hatine derxistin, dom dike û wiha didomîne: "Di vê rê de siyaseta dewleta Tirkîyê êrîşa xwe tenê nade ser hêzên siyasî ku ji bo mafê gelê Kurd têdikoşin, êrîş dide ser gelê Kurd jî."

TEVGER, bala Sekreterê NY dikîşîne ser tatbîqatên eskerî ku li ser erdên Kurdistanê tên kirin. Bi taybetî tatbîqata "Aştî û Mirin" wek mînakê dide û dibêje "Bi van kirinan dewleta Tirk dixwaze nîşan bide ku Kurd Tirk in û zimanekî bi navê Kurdî tune ye."

Ev tatbîqatên eskerî ji alî aborî ve zirarek mezin digihîne gelê Kurd. Pir caran eskerên Tirkan gundiyan Kurd bi darê zorê mecbûr dikin ku nan û xwarinê bidin eskeran. Nuka di nav gundiyan Kurdan de, ji bo ku xwe ji terora eskerên Tirkan biparêzin bertil dayin bi awakî fireh bûye metodek adetî."

"Hukûmeta Tirkîyê ji bo pêşdeçûna civakî û ekonomîk a welatê me tu tiştekî nake. Tiştê ku tê kirin tenê ji bo xurtkirina aboriya Tirkîyê ye û bi vî awayî sistema mêtin-gehkarî tekûztir dikin."

TEVGER di nameya xwe de cî dide surgunên gundên nêzî sînore Iraq, Îran û Sûriyê û dibêje ku vê sala dawî 243 gundên Dêrsim û 250 gundên ji herêma Erzincanê bi darê zorê hatine valakirin û Tirk di van gundan de bi cî kirine. TEVGER, nameya xwe awa didomîne: "Bi kurtî em dikarin bêjin ku ev siyaseta nijadperest û şovenîst a li dijî gelê Kurd ne nuh e, na xêr ev siyaseta han ji dema avabûna dewleta Tirkîyê dest pê kiriye. Ev siyaseta han doma siyaseta nijadperest û şovenîst a Atatürk ê ku ji alî opinyona gel a netewî wek avakarê Tirkîya modern tê nas kirin. Ev siyaseta bû, ku serhildanên di salên 1920 û 1930'î de bi xwîne pelçiqand."

TEVGER, di beyana xwe de diyar dike ku ew dixwaze dawîya talankirin, mêtandin û îşxalkirina Kurdistanê bîne û Kurdistanê ji bin nîrê Tirkîyê xelas bike û belavok wiha dom dike: "...Em dixwazin Kurdistanê demokratîk û serbixwe ava bikin da ku wek hemû welatên dinê civatek azad, dewletek serbixwe û demokratîk a ji alî ekonomîk, çandî û civakî pêşdeçûyî biafirînin."

"Gelê Kurd van du sed salên dawî ji bo mafên xwe têkoşin daye û di vê têkoşinê de bi hezaran keç û xortên xwe yê qehraman wenda kiriye. Em di stendina mafên xwe de bi qerar in. Emê ji bo azadkirina gelê xwe şer bikin û emê biserkevin. Dîrok wê şahidê me be."

12'ê Îlonê hat protestokirin

Îsal ji 8 saliya 12'ê Îlonê li Ewropayê bi tevgerên cur be cur hat protestokirin. Li Paytaxta Swêdê hêzên Kurd û Tirk di 11'ê îlonê de meşek çêkirin û bi navê "Komîta Protestokirina Faşîzma 12'ê Îlonê" ji belavokek belav kirin. Di belavokê dîr û dirêj li ser "îcreaatên" ku cûnta faşîst di van 8 salan de kiriye tê sekinandin. Di cîyekî belavokê de tê gotin ku "cûnta faşîst. bi destê waliyê kolonyal nêzîkî 30.000 kesî ji xelkê bi çekdar kirîye û her bi vî awayî dixwazin gelê Kurd berdî hev".

Li Almanya Federal di 10'ê Îlonê de li bajarê Frankfurtê mitîngek mezin li dijî 8 saliya cûnta fa-

şîst ji alî hêzên Kurd û Tirk ve hat organizekirin. Nêzî 3000 kes di mitîngê de beşdar bûn û ev mitîng bû mitînga rûreşkirina rejîma Iraqê.

Li Danîmarkayê hêzên Kurd û Tirk bi navê "Komîta Protestokirina Faşîzmê" li dijî 12'ê Îlonê belavok belavkirin, afîş dalaqandin û meşek çêkirin.

Li Yunanîstanê jî TEVGER û hêzên Tirk bi hev re 11'ê Îlonê li Atinayê li dijî 12'ê Îlonê meşek çêkirin.

Li Welatên Ewropa yê din jî yê ku Kurd û Tirk lê dijî bi gelek hawayî cûnta 12'ê Îlonê hate protestokirin.

Ji bo berdana Cemal Ozçelîk qampanya vebû



Li Stockholmê di meşa 12'ê Îlonê de bandrola "Medya Güneşi Susturulmaz" (Dengê Medya Güneşi Nayê Birrin) (Foto: Armanç)

Di 18'ê Tebaxê de Mahkema Ewlekariya (Emnî) Dewletê ya Stenbolê 3,5 ceza da xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Güneşi Cemal Ozçelîk. Li ser vîya li hundir û li derveyî welat ji bo berdana C. Ozçelîk û piştgiri ji kovara Medya Güneşi re qampanyeyek vebû.

Di 27'ê Tebaxê de li Stenbolê xebatkarên Medya Güneşi Panelê çêkirin. Di panelê de mebusê SHP yê Stenbolê Mehmet Alî Eren ji axaftinek kir û piştgiriya xwe ji kovarê re anî ziman.

10 kesên terefdarên Medya Güneşi jî ji bo tadeyî û zulma ku li ser kovarê dibe protesto bikin, ketin grewa birçîbûnê. Û grubekê jî tacegulek reş danî ber Mahkema Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê.

Li Swêdê Komîta Piştgiriya Kovara Medya Güneşi ava bû. Komîte jî bo azadiya xwedî û ber-

pirsiyarê kovarê, belavokek bi zimanê Swêdî belav kir û ji Organîzasyonê Eftû'yê daxwaz kir ku divê ew ji bo berdana Cemal Ozçelîk bixebitin.

Li Almanya Federal nêzî 500 kesî ji Serokkomarê Tirkîyê Kenan Evren re, ji Serokwezîrê Tirkîyê Turgüt Ozal re, ji Wezîrê Hundir Mustafa Kalemlî re û ji Wezîrê Edaletê Mehmet Topak re name şiyandin û girtina C. Ozçelîk protesto kirin. Di nava wan kesan da serekê Partiya Kesk, mebusê Partiya Kesk Cristina Kukielka, Michael, Partiya Komunîst a Alman (DKP), C.U.T.(Şîlî) Partiya Sosyal Demokrat-Hamburg, Haus For Alle (Mala Her Kesî), Komela Xwendevan û Ciwanên Kurdistan li Ewropa (UKSYE), Ciwanên Demokratên Filistinî (DDJ), Azarîa (Afrika başur) û h.w.d. hene.

Ji Redaksiyona Medya Güneşi re

Em bi liberketinê pê hisiyên ku ji xwedî û berpirsiyarê kovara we re ji alî Mahkema Ewlekariya (Emniyeta) Dewletê ya Stenbolê bi awayekî anti-demokratîk û bi sebebên bê mantiqê sê sal û niv ceza hatiye birrin.

Di her çar hejmarên kovara we yê ku heta nûha derketine, we bi cesaret siyasetek ku li ser bingehê rastîyan ava bûye, da meşandin. We li gorî qewet û îmkane xwe, perda (xêliya) li ser tabûya Kurd û mesela gelê Kurd bû çirand; hûn bûn deng û guhê gelê meylmazlûm ku ji sedsalan ve ye ji alî hêzên paşverû û nijadperest ve biçûk tê ditin û heta bi tevayî hebûna wî jî tê înkarkirin.

Ji xwe tiştê ku hûn kirin textê nîşanê û bû sebebê ku ji xwedî û berpirsiyarê we, heval Cemal Ozçelîk re ji alî DGM ya Stenbolê sê sal û niv ceza bê birrin ji ev yekê hanê bû. Bi kurtayî, hêzên paşverû û serdest nikarin tahamulê germiya tîrêjên Medya Güneşi bikin. Bila bitirsîn, heqê wan heye, lê tu feyda tirsê ji ecelê ra tune ye...

Em wek rojnama ARMANÇ, topkirina kovara we, derxistina astengan li pêşiya belavkirina wê û a paşin jî (sê sal û niv) cezakirina berpirsiyarê we, C. Ozçelîk protesto dikin.

Bi baweriya ku ewê tu tade û zordarî, nikaribe we ji têkoşina we, politika we ya weşanî ku li ser bingehê rastîyê û objektîf e nikaribe dîr bixîne, em di vê xebata giranbiha de serfiraziya we dixwazin. Hûn baş zanibin ku di têkoşina we de emê her dem bi we re bin.

19.09.1988


Redaksiyona
ARMANÇ'ê

Li Fransayê raxistina foto li ser jiyana Kurdan

Şuayîp Adlîg (Pirtûkêk wî ya li ser foto di nav weşanên Jîna Nû de çap bûye) û Şairê Fransî Yves Jouan raxistinek (ekspozîsyon) foto û şîra bi navê "Foto ji Kurdistanê- beşê yekem" li Fransayê li bajarê Louviers, li tiyatroya "Liquides" di 16'ê Îlonê de vekirin. Di vê raxistinê de 17 foto li ser jiyana gelê Kurd hat raxistin û li kêleka van fotografan şîrê Y. Jouan hatin nivîsandin. Raxistin wê heta 15'ê Çiriya Pêşîn ji mewanan re vekirî be.

Roja yekemîn a vekirina raxistinê aktrîsta Fransî Annick Jamet ji şîrê Y. Jouan listikêk xweş pêşkêşî mewanan kir. Di roja vekirina raxistinê de xeynî mewanan hinek rojnavevanên Fransî yê mehelî jî beşdar bûn û di gelek rojnaman de nivîs li ser raxistinê derket.

Şuayîp û Yves dixwazin vî ekspozîsyona xwe hîn fireh bikin û li hin bajarên Fransa û li welatên din jî vekin. Dixwazin pirtûka fotograf û şîra bi Fransî, Îngilîzî



Şuayîp Adlîg û Yves Jouan li ber çend fotoyên di raxistinê de

û Kurdî jî çap bikin.

Ji bo ku ev xebata xweş bi ser keve, dibê her Kurdê welatparêz piştgiriya van xebatkarên bike, ji

ber ku ew, jiyana gelê Kurd rê bîyanîyan didin.

Ahmedê Emer

Adresa ARMANÇ'ê ya nuh
P.Box: 6004
172 06 Sundbyberg / Sweden

TEVGER li Kurdistana Bakur gaveke girîng, organîzeyeye demokratîk û netewî ye

Selîm Keya
Sekreterê Yekîtiya
Sosyalîstên Kurdistan

Di 22'ê Hezîrana 1988'an de piştî ku TEVGER hat îlankirin ji alî bîr û raya şoreşger demokratîk a Tirkîyê û Kurdistanê ve tavlîlê bû hadîsak bal-kêş. Alî din jî kovar û rojnamên burjuwazî bi sernivîsên (rûbrikên) xeberan nerazîbûna xwe ji TEVGER'ê re dan xuyanîkirin. Ev reaksiyona ku rojnaman nîşan dan, reaksiyona kolonyalîst û şovenîsta ye.

Ji ber ku di demek kin de TEVGER ji alî dostên gelê me bi kêfxweşî û pozîtîv hat qebûlkirin û dijminên me jî reaksiyonên xwe ji TEVGER'ê re nîşan dan. Pêwîstiya ku gelê me TEVGER'ê bijîne, bi xwe derket ortê.

Berê 12'ê Îlonê perçebûna tevgera demokratîk a netewî tiştêkî negatîv bû. Her çiqas di çerçewa hevkarîya demokratîk a netewî de xebat hatibû kirin jî lê ew xebat ji sewîyeye mehalî derbas nebû. UDG her çiqasî bi prensîb yekîtiya hemû hêzan dabû ber xwe jî, berî û piştî îlankirina xwe di pratîkê de xebatek nekîr. Lê dîsa jî di warê yekîtiya hêzên demokratîk û netewî de gavek bû.

Piştî 12'ê Îlonê jî bo yekîtiya hêzên demokratîk û netewî xebatek mezin hat meşandin. Di vê demê de di warê yekîtiyê de xebata 5 hêzan bi navê HEVKARÎ'yê tê. Di rewşa siyasî ya wê çaxê de ew xebat pîrriya rêxistin û partiyên welatparêz di bunya xwe de dicivand. Ev xebat ji ber sebebên ku tê zanîn ne çû serî. Lê belê pîrri hêzên welatparêzên Kurdistan bawerîya xwe ya ji bo yekîtiyê wenda nekirin. Bilekis xebata xwe dan domandin. PLATFORMA ALMANYA fêkiyê vê xebatê bû.

Tiştêkî vekiriyê, ku TEVGER, fêkiyekî xebata berî û piştî 12'ê Îlonê ye. Û berdewama xebatên HEVKARÎ û PLATFORMA ALMANYA ye.

TEVGER, wek di program û civîna xwe ya çapemenî de daye xuyanîkirin. xeynî "PKK" ew jî hemû rêxistin û partiyên welatparêzên Kurdistanê re vekiriyê û bi vî perspektîvê hatiye avakirin. Hinek rêxistin û partiyên Kurdistanê jî ber hinek sebebên di nava TEVGER'ê de cî negirtine. Bi bawerîya me di rojên pêş de wê van sebebên bi hêsanî ji ortê rabin. Ji xwe program û destûra TEVGER'ê jî hemû rêxistin û partiyên welatparêzên Kurdistanê re; jî "rêxistinên civakî" ku temsîla wan ya netewî heye û jî hemû kadirên welatparêz re vekiriyê ew perspektîva wê heye.

Programa TEVGER'ê; şoreşa demokratîka netewî, hêzên welatparêzên Kurdistanê daxwazên çîn û tebeqên welatparêzan ûne ziman û menfeetên wan diparêze û bi vî hawayî jî programa

meke nûjen e.

Waxta program û destûra TEVGER'ê bê tetkîk kirin, tiştên ku bi salan di navbera tevgera demokratîk netewî ya Kurdistanê de sebebên munaqesêbûn û pirsên ku hêzên welatparêz jî hev dîr dixistin ew hemû hatine hel kirin. Ev jî bi hêsanî çênebûye.

Bi kurtayî ku meriv li programa TEVGER'ê binêre;

- Di programê de bîr û baweriyek tarîxî ku hemû hêzên welatparêz li ser hemfikir bin hatiye avakirin. Li dîroka têkoşîna gelê me, li ser serhildanên netewî ya gelê me, bi aliyên wan yê pozîtîv û negatîvî û bi mantiqê rexnegîrî hatiye lê xwedî derketin. Mîrasa têkoşîna gelê me nehatiye înkarkirin; giramiyên rexnegîrî jê re hatiye nîşandan.

- TEVGER di programa xwe de wezîfên hêzên welatparêzên Kurdistan bi hawekî zelal eşkere kiriye. Waxta van wezîfan bîn analîzkirin wê wezîfa bi rûmet, wek guherandin û pêşxistina

wendiya gel û rewşê bidin ber çavan û li gor wê jî bo yekîtiya welat bixebitin.

TEVGER, organîzasyonêke hayalî nîne. Hundiirê sînorên jî TC'ê de têkoşîn dide. Ji bo viya jî, îtîfaq bi gelê hundirên sînorên TC re, bi hêzên wan ên demokrasî re hevkarî û piştgirî jî bo menfeetên gelê me wezîfeyek e.

TEVGER, di têkoşîna rizgarbûna gelê me de, qîmetê dide tifaqên hêzên navnetewî jî. Di programa xwe de siyasetek derva ya "serbixwe û bêteref" bi prensîp qebûl kiriye. Bi hêzên cihanî yên aşîxwaz, demokrat û sosyalîst re û bi tevgerên rizgariya netewî re wê dostanî û hevkarîyê bike.

TEVGER, "organîzasyonêk demokratîk û netewî ye". Li ser esasên demokratîk merkezi dîmeşe. "Hemû endam xwediyê heq û wezîfên wekhev in." Rêxistinên ku TEVGER damezîrandine serbixweyîya wan heye. Lê belê tê zanîn ku ew serbixwebûn bi menfeetên TEVGER'ê û xelkê ve sînor kirî ye.

Di vî merhela îro de gelek wezîfe dikeve ser milên hêzên ku TEVGER damezîrandine. Çaxa ku em bi vî zanîne û li gor vî mesûliyetê hereket bikin wê TEVGER bibe merkezeke civandîne. Ger ne wisa be, firebûn û xurtbûn jî bo hemû hêzên welatperwer ne mumkûn e. Lê li aliyê din jî, heqê me jî heye ku ji hemû kes û hêzan daxwaza gavên bi mesûliyet bikin.

civakê bê dîtin. Ev guherandina statûqoyêye. Di qismê armançên siyasî de tê gotin ku "nîrê kolonyalîzma Tirk û hevalbendên wan ên hundir wê bê rakirin û Cumhûriyeta Demokratîk a Kurdistanê ya serbixwe wê bê damezîrandin". Ev tespît bi salane ku di navbera rêxistin û partiyên welatparêzên Kurdistanê de hebûna gelşa stratejîyê hel dîke. Ev gawe girîng û mezin e.

- Di xebata damezîrandina TEVGER'ê de pîrsa ku li ser hat sekinandin yek jî pîrsa rengê têkoşînê bû. Di wê munaqesê de "xweş xuya ye ku hêzên kolonyalîst û emperyalîst bi dilxweşî, bê xwînrijandin û bê ceng dev ji welatê me bernadin" hat tespîtîkirin û rengê têkoşînê hat tayînkirin. "Li hemberî vî mafê gelê me yê meşrû û bivê neyê ye ku têkoşîna çekdarî jî tê de, serî li darê zorê xe" li ser vî tespîtê "têkoşîna şoreşger û demokratîk, li gor rewşê, yek bi yek, an jî tev de, ligel hev wê bikar bîne".

- TEVGER, sînorên ku li gor berjewendiya emperyalîzmê û dewletên zordar yên heremê hatine kişandin û Kurdistan perçe kirine "sînorên ne tebiî û zordestî" dibîne û emê berje-

Di helkirina konfliktên di navbera rêxistinên de politîka zordariyê bi kurtayî hatiye redkirin.

Rêxistin û mensûbên TEVGER'ê pêwîst e ku biryarên organa binin cî. Biryar li ser mantiqa demokratîk merkezi tê stendin. Hindikayî tebiî pîrriyê ye. Organên jêr bi organên jor ve girêdayî ne û li ser vî esasî kar dikin.

TEVGER, bi şikleki nuh "organîzasyonêke demokratîk û netewî" ye. Ev organîzasyon li ser koordînasyona partî û rêxistinên welatparêzara ye.

Hemû partî, rêxistin û "organîzasyonên civakî" ku di seviya netewî de gihîştine berpirsiyariyê, dikarin bibin endamê TEVGER'ê û di organa de temsîl bibin. Ji hêla din jî kesên welatparêz jî "mensûbiya" wanê endametiye heye.

Em bawer dikin, jê qet şik tune ye ku ew mantiq dikare hêzên bi girseyî pêk bîne. Bi taybetî qebûlkirina damezîrandina organîzasyonên girseyî yên netewî dawî daye munaqeseyek di nav hêzên Kurdistanê de. Vê merhela em tede, di serî de jî Ewropa û li welat bi girseyî qet xetek siyasî ne hakim e, loma jî divê rêxistinên fireh,

Stîriyên me

Lawikê Berrîvanî

Şîretên Xoce Nesredîn

Li ser Xoce Nesredîn gelek mesele tîn gotin. Meriv nîzane ji van meselan bi rastî kîjan ên wî ne û kîjan li ser navê wî tîn gotin.

Lê ya muhîm hemû meselên Xoce Nesredîn, ji ken bêtir merivan bi gelek alî dîdin fikirandin. Di vî quncikî de ez dixwazim ji wan, qala du meselan bikim.

Xoce Nesredîn rojekê kerê xwe yê meşhûr biriye mazatê (bazarê). Di nav mazatê de çûye û hatiye, bi dengê bilind ban kiriye, gotiye: "Difroşim, difroşim" cambaz û kesên ku dengê Xoce bihîstine tavlîlê li dora wî kom bûne. Yekî xwestiye li diranê kerê mêze bike, kerê dev lê kiriye; nehiştiye ku mêrik li dirana binêre. Yekî din derbasî paşiyê bûye xwestiye dêla wî rake, kerê zîtekek baş lê xistiye, mêrik di cî de tevizandiye. Welhasil kî nêzikî kerê bûye, kerê derbek lê xistiye, nehiştiye yek muşterî jî bi semtê ke ve.

Li ser vî, delalê mazatê li Xoce rabûye, gotiye:

"Zû vî kerê xwe bibe ku hîn kes seqet nekiriye. Ev ker tîzokî ye, kerê tîzokî kes nakire."

Xoce Nesredîn keniyaye, gotiye:

"Ji xwe min ew jî bo firotinê nanîbû ku!"

Kesên li dorê giş şaş mane, gotine:

"Heger te jî bo firotinê naniye û tu yê nefroşî, lê te jî bo çî anî mazatê?"

Xoce bersiv daye, gotiye:

"Ji bo ku her kes bibîne ez jî destê vî kerî çî dikşînim!"

Jina Xoce ya ewil jinkek bê debar, dîlbaz, bê ehlaq û tu heta bixwaze derewçîn bûye. Her roj, tiştê nemayî anîye serê Xoce. Xoceyê feqîr jî destê wê ketibûye êlamanê, nizanîbûye çer bike. Gelek caran ji xwe re gotiye: "Sal û zeman xerb hatiye, nuha ez berdim mîletê hezar çîrokî li ser derxe; ez bernedim mereza kedî ye, kula bi rîş e..."

Welhasil, heta jî Xoce hatiye ji ber daxwariyê, "sê kevirê wê" nekiriye mistê...

Rojekê di cimatkê de, heger çawa bûye Xoce jî vî jina xwe ya fêlbaz cardin gazin kiriye, gotiye "Heyhewar, ez kezebreşî bûm, êdî nayê kişandin!" Ji cimatkê yekî pîrsiye, gotiye:

"Xoce, ev çend sal e ku tu bi vî jinikê re zewicî ye?"

Xoce gotiye:

"Ev sed sal e zewicî me!"

Li hember vî bersiva Xocê mêrik şaş maye, gotiye:

"Yasîtar Xoce, umrê te hîn çel e û tu dibêji 'ev sed sal e ez zewicî me, ev çawa dibe?"

Xoce keniyaye, gotiye:

"Dibe dibe, hela carê tu were li mala me bimîne, tu yê bi çavê serê xwe bibîne roj, meh û sal çawa derbas dibin!"

ku demokrasî tê de hakim be û ji mafê herkesî re hurmet bê nîşan dan, bîn avakirin û yên hene jî bibin yek. Ev li menfeeta têkoşînê ye. Bicîanîna vî wezîfê mecbûrî ye. Bi serketîna vî wezîfê wê hereketeke bide têkoşînê û ruhê yekîtiyê pêş de bibe.

randine. Çaxa ku em bi vî zanîne û li gor vî mesûliyetê hereket bikin wê TEVGER bibe merkezeke civandîne. Ger ne wisa be, firebûn û xurtbûn jî bo hemû hêzên welatperwer ne mumkûn e. Lê li aliyê din jî, heqê me jî heye ku ji hemû kes û hêzan daxwaza gavên bi mesûliyet bikin.

□

Xaliyên Kurdan

J. Kurdo
Wergêr: Lewend Firat

Bingeha xaliyên Kurdan gelek kevn a. Çar sed sal berî Miladê di atolyên zanaatkarên Eleman de dest pê kiriye û viya meriv dikare di matbûatan (press) de jî bibîne. Taswîrên li ser matbûatan nîşan didin ku, jin li pey hev rûniştine û tevnê dê dikin. Taswîra xaliya yekem ku bi balkêşî hatiye nexşandin li ser qabertmên Asûriya ye. Di wan qabertman de qîmeta ku qiral û sereya Asûriyan didin berhemên cîranên xwe tê xuyankirin, ku wan gelecaran êrişî cîranên xwe kirine û ew talankirin e.

Herêmenê Kurdistanê yên hiriya herî bi qalîte lê heye, mîntîqa Gola Ormiyê (Koî, MAkû, Salmaz, Senandaj) û mîntîqa dora bajarê Kermansah e. Bi saya qalîte xwe ya teknîkî û sinetî xaliyên Kurdan ne tenê di malên Rojhilata Navîn, dinya yê jî gelek xanî xemilandine. Tesîra xaliya ku meriv cezb dike, ne tenê di dekora wê de ye. Xalî dîtinek felsefî û tradîsiyona kulturekê ye ku ji baweriya mirovê îptîdaî heta Marşa Awest û îdealîza bilind û şûra qirîne nawendî (dewra mezolîtîk teqdim dike. Xalî muzîk û folklorê Kurdan îfade dike. Ew, tîkiliyên tebîet û însanan û ebediya manewiyeta Kurdan eks dike.

Nasîna Ewrûpa û Asyayê bi xaliyên Kurdan bi riya bazirganiya ku di navbera Çînê û Hemedanê dibû bi navê "Riya Îpekê (kop-rîna)" tê zanîn û bi Sefera Xaçperestan dest pê kiriye. Bazirganiya ku di navbera Rojhilat û Rojava de dibû ji malên Kurdan, perçeyên mezin xalî bûn. Xeynî xaliyan, hirî, çerm, şîrêz û h.w.d. hebû

Taswîrên analîzên estetîkî û edebî nîşan didin ku nexşên li gor motîvan ku li ser xaliyên Kurdan çêbûne ev in: nebat (bîtîkî), heywan, insan, sembol û teswîrên geometrîk in. Yên ku pîrr caran bi kar tên, nexşên nebatên Dara Muqqades in, yan jî darên jiyane ne ku ew bi giramiya (hûmeta) dê (dayik) û bi bereketê ve girdayî ye. Ev, li ser xaliyan ne wek babetên reel, wek sembolên mîto- lojîk tên xuyankirin. Motîvên din jî ji nebata kulîlk û pel in. Lotûs (fûlê Hind û Misrê) yek ji nebatê zelal tê xuyankirin û ge- lek xweşik e. Ew sembola bereketê û rojê (tavê) ye. Tav germiyê dide hemû ruhberan ku mezin bin. Kurd jî vê tavê re dibêjin Xor (îro xorûs) û ji Grekiyan Romaniyan stendine. Ev nebat pîrr bi cazîbe ye û bi gelek hawayî tê bikaranîn. Carna di merkeza vê nexşa nebatê de şerekî har tê çêkirin. Ev reela groteska (gro- tesk heywanan bi pêkenîni û xerîb dide nîşandan) dekoratîvî ye û ya baweriyekê ye. Tewirek nexşên din jî gul e. Lale nexşekî esasî yê nebatên formê xaliya ye. Pelên ku ji bo xaliyên Kurdan pîrr tên taswîp kirin pelên reza ye. Pelê reza, gul û lale di lêvên



Xaliya Wanê, Sedsala XIX, 300 x 170 cm. (Muzeya Berlîn a Rojhilat)

(qeraxên) xaliyan û him jî di orta xaliyan de tîkî bikaranîn. Carna nexşên nebatan bi serê çivîkan (pîrranî dîk) yan jî bi serê du maran ve û merkeza wê jî bi maska şêr ve tê xemilandin. Bi tevayî terkîb (sentez) xususiyetek esasî ya sinetê Kurdan e û ew jî, ji îcata mîto- lojiya Kurda tê. Nexşên dinê ku gelek di xaliyên Kurdan de heye ew jî zambaqên ku tewirên wî cuda cuda ne, wek bûtîk (tomrix) hîv û xe- lekên gilover li ser du qolona û ziddê hev û bi dirêjayeke wekhevîyê dirêj dibin. Nexşên wan çixîzên besît tên xuyankirin, lê belê struktura wan a hundir gelekî giran e.

Nexşên ku bi tewirên heywanan jî li ser xaliyên Kurdan gelek ji wan bi şiklên babet babet in. Heywanên cihê cihê bi rengên xaliyê ve tê taswîr kirin. Di nava

wanan de neçirvanên heywanên bejî (ne kedî) yên herî pîrr in. Di xaliyên Kurdan de mirov dikare rismên şêran, teyran, teyrên baz, xezalan, dîkan, hespan, teyrê tawus, kewan bibîne. Dîk sembola rojê ye. Di mîto- lojiyê de tav her roj him li rûyê erdê ye û him jî di binê erdê de ye. Berbanga sibê derketina rojê wek agir şew dide, êvarên jî tîrêjên wê dimre û tarî dibe û nayê dîtîn. Tê gotin ku azana dîkan berra şeytan û xirabiyê dide, ji ber ku azana dîkan wek tîrêjên berbanga tavê ye û ji ronahiye re xizmetê dike. Hesp bi Xwedanê rojê ve girêdayî ye. Bizin û bi taybetî jî bizinên çiyayî bi hîvê û baranên ve girêdayî ne û ew sem- bola bereketê ne. Qiloçên bizinê wek hîva çarde rojî ye û hîva çarde roja jî yek ji formên hîvê ye. Xalî bi fantazyên babet babet

yên mehlûqên mîto- lojî ve dewlemend dibin. Figûrên însanan jî geometrîkên xurt in, lê carna taswîrên reel jî hene. Vana berî her tiştî, li ser neçirvaniyê ne. Nexşên geometrîk netîcên daîmî yên şiklên edebî û eserên nebat û heywanan teswîr dikin. Çizgiyên ku li ser xaliyan bi kar tên; rast in, şikandî ne, xorîzont û verdiqal in, formên ku li ser xaliyan çêdikin jî çargoşe ne, sê goşe ne, pîrrgoşe ne, çep û rast in, stêr in û rozet in.

Li gor mewziyan hin tewirên xaliyan hene; yek ji wan jî nexşên geometrîkên ku meriv divê qey raste-rast danûstendina wan bi çavkaniyên reel yê tebiyetê û jiyane ve tune; a dinê, baxçeyan teswîr dike, a sisiyan jî, hedîsên neçirvaniyê teqdim dike.

Fikrê ku baxçeya teswîr dike ji bax- çê cînetê ne cuda ye, ji ber ku ew gelek xweşik e, pîrr babet e û ge- lek cazîb e. Ev fikir yek ji fikra bingeha kultura Kurda ye û viya hewqas unîversal e ku ne tenê teswî- rên arizî (xas) yê hemû mefhûma teqdim dike.

Li gora dekora xwe, xaliyên Kur- dan du tewir in: Yek "Medelîon" e, ya din jî "vazo" ye. A yekem pîrr şiklîye û bingeha

taybetiya wê jî du perçê simetrîkê ku bi medelîyon şikil bûye. Di dekora "medelîon" de du şîrît hene; yek ji wan fireye, ya din jî teng e. Dekora "vazo" yê di şiklên sinetê xaliyan de tê xuyankirin. Ji navê wê jî tê fehm kirin ku figura esasî vazo ye. Ev sembolek gelek kevn e û bi bereketê ve girêdayî ye. Di xaliyan de ew, li ser hîlalê cî digre û bi kulîlk, yan jî bi nebatan ve tê xemilandin. Vazo û kulîlk sembola dewlemendiya rekoltê ye. Şiklên wan xaliyan dirêj û teng in, dirêjbûna wan jî fi- rebûna wan 3 qat zêdetir e. Lêvên (qeraxên) wan pîrr teng in.


Xaliyên Kurdistanê him bi afirandinên xwe û him jî bi dew- lemendiyan xwe aheng û nexşên xwe, ne tenê qereqetera kultura kevn a bajarê Kurdan nîşan dide, her wisa ew, estetîk û manewiye- ta fikerek gelek pêşketî jî îfade dike. Li Kurdistanê şertê coxrafîk û îklîmî musaade dike ku hiriya bi qalîte û bi her rengî bê para- stin. Ev jî ji bo afirandinên xaliy- an şertek e.

Bi sedsalan berê li çend merke- zên Kurdistanê jî bo çêkirina xaliyan cî avabûne. Ciyê herî mezin li bajarê Senandajê, li bajarê He- medanê û li ciyên ku Kurdên Lorî û Bextiyarî dijîn in.

Qarekter û xususiyetên xaliyên Kurdan ew in:

- 1- Wek kompozîsiyon paqij û sade ne.
- 2- Di warê aheng û formê de li- hevhatîne
- 3- Di xaliyan de danûstendinê genetîk û întîqalî di navbera kul- tura prîmîtiw û kultura civaka koletiyê û kultura esra ortê de bi motîvên nûjen tên xuyankirin.
- 4- Di malên Kurdan de xalî xeynî fonksiyona wê ya hewceda- riyê, wexta bi dîwar û binqatiya (tawan) dixin qîmeta wan wek ta- bloyan (risman) jî heye. Her çibe jî, ew faktorek esasî ya tekiliya di navbera mîmariyê û însanan de ye.

Xaliyên Kurdan di hemû dîroka xwe de ji alî jin û zarokên Kurdan ve çêbûna (xeynî îstîsnayan). Ew jî berbanga serê sibê heta tariya êvarê xebitîne. Xwedî û afirvanên (çêkirên) xaliyên Kurdan wek folklorê Kurdî, xwedî cardin hemû gelê Kurd e. Xalî sermiyanekî ne- tewî yê mezin e. Ev sinet di se- viya unîversalê de ye û ev di medeniyet û kultura cihanê de sembola gelê Kurd e.



Xaliya Sanandaj, sedsala XIX, 203 x 125, Muzeya Karl Marks, Almanya Rojhilat

Umer Şêxmûs:

"Însanê muhacir gava nuh tê wela eynen wek zarokekî ku nuh ji diya xw

-II-

Armanç: *Wek welat, meriv dikare hebûna Kurda li çend welatan bijmêre?*

U. Şêxmûs: Niha bi rastî welû bi serda hatiye ku kêma welatê dinyê heye ku lê Kurd lê tune bin. Min nebîhistiye ku li Zelanda Nû Kurd hene. Profesorekî li Universîta Nu Zelanda meqalek pir baş, li ser rûyê cîhanê li ser mesela Kurd nivîsiye. Nizanim întereseya wî çawa ye. Kurd li Awusturalya hene. Hejmarek başe jî. Li Kanada, li Amerîka hene. Li piraniya welatê Ewropa hene; li şerq û li xerb. Li Çînê hene, li Mongolîstan min nebîhistiye ku Kurd hebin, li Koreyê min nebîhistiye ku Kurd hebin. Li Kuba Kurd hene. Li welatên Amerîka Xwarû ez nizanim.

Armanç: *Kek Umer te bahsa welatên ku Kurd lê hene kir. Di wî warî de rewşa Kurdên Lubnanê rewşeke taybetî ye, ew, li wê xwarê xwe wek jibîrkirî hîs dikin. Gelo rewşa Lubnanê û Filistinîya ya siyasî çî tesîrê li Kurdên Lubnanê dike?*

U. Şêxmûs: Gor zanîna min li ser Kurdên Lubnanê (wek tê zanîn demekê li wira bûm jî), ev rewş bi du aliyên tesîrê li ser wan dike. Mumkun e ku tesîreke din jî hebe. Lê meriv dikare bike du alî. Hinek tesîrên baş, hinek tesîrên xirab. Tesîra baş, bi taybetî hebûna hêzên Filistinî heta salên 1982' ya. Ji ber ku ew jî miletekî bîndest in, xebatekê dikin ku welatê xwe rizgar bikin. Eva dibe wek hevîrekî ku tesîrê li ser Kurdan bikin, çî di alî rêxistinî de, çî di alî îdeolojîk da, çî di alî metoda kar de, çî di fêrbûna hinek rengên xebatê û rojnamegerî û karê siyasî de be, wana tesîreke baş li ser wan kir. Çûnkî gelek ji xortên wan ku di-xwendin, di nav wan de kar dikirin, di-çûn mektebên wan, diçûn enstîtûyên wan, di nav programên wan de kar dikirin û gelek ji wan jî dûra bûn wek pêşmerge û di nav hêzên wan de xebata xwe domandin. Vaya tesîreke baş dike. Çûnkî pileya tîgîhîştina wan bilind dike, tecrûba wan dewlemendtir dike, danûstendinekê biratî di navbera du miletên bîndest de tîne pêş. Ji ber ku rewşa Kurdên Lubnanê gelekî xirab e. Heta niha, mumkune bav û bapîrê wan jî li wir ji dayîk bûne lê cardin jî cinsiyê nadin wan. Lê yekî ku cinsiyeta wî, îqama wî tunebe gelek heqê wî jî tune ye. Mese-la heqê wî yê milk tune ye, di gelek meselan de heqê wî tune ye. Yanî ji ber vîya, parastina wan ji alî hêzên şoreşa Filistinê tesîreke baş buye li hember dewleta Lubnanê û dezgên Lubnanê.

Ji aliyê din de, wek min got bi xwen-

din û bi tedrîkkirin û çûna nav rêzên wan, gelek tiştan fêr bûn ku îmkanên wan bi xwe tunebû. Çûnkî piraniya Kurdên Lubnanê wek me bahs kir, gundî bûn, ji Kurdistana Tirkîyê û Suriyê çûbûn. Însanê ne xwende bûn, firseta wan jî tunebû. Çûnkî di hêla ekonemî de gelekî hejar bûn. Îmkanê wan tunebû ku li Lubnanê jî herin mekteba. Ji ber vîya tîkhebûna wan di gel hêzên pêşverû yê Lubnanê û Filistinîyan li Lubnanê tesîreke gelek baş berda. Lê tesîrê wan yê xirab çî bûn? Tesîrên wê yê xirab, wek hûn dizanin tevgera gelê Filistinê gelek perçe ye. Nêzîka 10-15 rêxistinên cûda di nav PLO' de kom bûne. Û her yek ji van rêxistin û pêşmerge-gên wan ên taybetî hene. Gava ku Kurd jî bi wan re tîkil bûn, Kurdên Lubnanê jî perçe perçe bûn. Ji dêlva ku rêxistînek wana hevgirtî hebe, hêzên xwe kom bikin, wek şexsiyetek hevgirtî di gel şoreşa Filistinî de bigrinbistin, li ser esasekî taxim taxim û fert fert çûn nav rêxistinên Filistinî û viya jî perçabûn zêde kir.

Ji aliyê din da malesef, hinek kêmasî di nav şoreşa Filistinî de hebûn -ku di nav hemû şoreşên dinyayê de hene- lê di nav wan de, bi taybetî mesela malî dewrekî mezin dilîhîst. Yanî yek ji faktore-n ku li hember Îsraîliyan li Lubnanê şikes-tina wan ev bû, ku pêşmerge û serokên wan maaşekî zêde digirtin. Ji-yaneke luks didan wan. Evaya ruhê şoreşgerî hinekî dimirand. Ew hinek hêzên Kurdan ku çûn nav van -ne tenê ji Kurdan ji miletên din jî hinek çûn nava wan- bi çavekî eskerên "bi pere" li wan dinerîn. Çek didan wan, pere didan wan. Bê ku di hêla îdeolojî, fikrî, siyasî da wan pêş xînin. Di nav rêxistinên xwe

yên leşkerî da ew bi kar dianîn. Heta hinek Kurd çûbûn nav Falanjîstan, di gel wan kar dikirin. Ji hemûyan, ên ku danûstendina wan li gel Kurdên Lubnanê baş bû û ferqa cudayî di navbera wan û pêşmergeyên xwe de ne dikirin, Cepha Demokratî bû, dudu Cepha Şahbî bû. Yanî Cepha Demokratî a Naîf Hewatman û Cepha Şahbî ya George Habeş. Û Partiya Sosyalîst a Pêşverû ya Lubnanê -ya Kemal Canpolad- Ew jî ji ber ku xwe Kurd dizanin. Ji kevn de çend caran bavê wî pozîsyon li ser mese-la Kurd standiye û çend caran ku

Zahmetiya sisiya ewe ku, gava însan ji welatekî derdikeve tê welatekî din, jiyaneke dîr û dirêj dawî tîne...û dest bi jiyaneke nuh dike. Meriv wek zarokekî nuh, jiyaneke nuh ava dike. Vaya bi xwe ne hêsan e di jiyana însanekî de. Jiyaneke nuh, xanîkî nuh, hevalên nuh, karekî nuh, li herêmeke nuh, li welatekî nuh...

bahs bûye gotine em Kurd in. Yanî dîtin û pozîsyonekî wan ê baş hebû. Ne Fete-h, ne jî hêzên din, ne wek wan bûn.

Tesîrê xirab bi vî hawayî bû: Yek tesîra şoreşgerî di nav wan de dimirand, dudu, wek eskerên bi pere li wan dinêrîn, a sisiyan jî, dêlî ku yekîtiya wan zêde bike, perçebûna wan zêde dikirin.

Armanç: *Wek te li jor jî behs kir, ev demekê dîr û dirêj e ku tu li dervayî welat dijî û dijwariyên penaberiyê (multecîtiyê) tu jî dizanî. Gelo ji bo penaberekî Kurd dijwariyên herî mezin çîne?*

U. Şêxmûs: Li gor ew lêkolîna ku niha em dikin ew hevpeyvînên ku me kirine û li gora tecrûba xwe ya xususî ezê bahs bikim. Ez karim wan zahmetiyan di çend noxteyan de bi kurtî bahs bikim. Yek ji wan, însan gava ku dest ji welatê xwe, ji merivê xwe, ji dostê xwe, ji kultura xwe hildigre, yek ji wan zahmetiya herî mezin e ku her însanek dibîne. Wek min berê jî bahs kir yek ji wan biryara herî qurs û giran e ji însanekî ra ku wê gavê

bavêje. Yanî ev bi xwe yek ji wan mese-lên ku gelekî tesîr li wijdanê însan dike, li hişê însan dike, li hîsê însan dike; ev biryara hemû bi xwe ye. Yanî wek, tu masîkî ji nav deryayê derxîne; wele li serê meriv tê. Ew li alîkî.


Li aliyê din xerîbî tiştêkî gelek ne xweş e. Yanî paş vê gava ewilî ku meriv dest ji welat û miletê xwe berdide, di gel ku bi xewna, bi daxwaziya dil çavê meriv tim li welat e. Lê hatina dervayî welat, ev gava hanê, ji xeynî wê, te tuşî teniyayê (tenêbûne) û xerîbiyê dike. Heta, gava meriv di nav heval, dost û hevalên siyasî de be jî ew hîsê xerîbî û teniyayî û dûrbûna ji welat problemeke mezin e û wextek zêde jê re dibê heta ku însan qebûl dike. Mumkun e 15-20 sala dirêj bike, bê ku însan bikaribe vê zahmetiyê derbas ke.

Zahmetiya sisiya ewe ku, gava însan ji welatekî derdikeve tê welatekî din, tu jiyaneke dîr û dirêj dawî tîne...û dest bi jiyaneke nuh dike. Meriv wek zarokekî nuh, jiyaneke nuh ava dike. Vaya bi xwe, ne hêsan e di jiyana însanekî de. Jiyaneke nuh, xanîkî nuh, hevalên nuh, karekî nuh, li herêmekî nuh, li welatekî nuh. E vaya yek ji wan zahmetiyên ku gelekî kar û îmkan û enerjî jêre divê û di hêla psikolojî de jî haziriyê dixwaze.

Zahmetiya din bi taybetî di nav penaberên siyasî de hatina dervayî welat û bûna paneber gewretirîn krîz e di jiyana wî da. Di du meselan de: yek; gava ku tu wî ji miletê wî dîr dixê, ji xelkê wî dîr dixê, tu atmosferekî vala di jiyana wî de dihêle.

Ya duduya ku gelekî tesîr lê dike, wîcdanê wî tim wî diêşîne. Çima? Ji ber ku însanekî siyasî tîkoşer e, tim li wiya difikire ku hevalên xwe yê xebatkar berdaya û hatiye dervayî welat. Di gel ku mumkun e ku rêxistina wî jê re gotibe yan jî rewşa wî ya polîs û emniyetî gîhabe derecekê ku nemaya karibe li welat bimîne. Mumkun e bi kêfa xwe hatiye. Yanî çawa dibe bila bibe, derketina wî, ji bo însanekî tîkoşer û siyasî wîcdanê wî tim bi êş û bi ezab dimîne li beramber heval û dost û refîqên xwe yê kar û xebatê. Meriv di nav pêşmergeyan û di nav însanên siyasî de pirr eşkere dibîne, gava ku meriv bi însanên penaberên siyasî re hevpeyvîn dike, di gel ku li vir xwe gelekî diêşîne, kar dike, xebatê dike û rehetiya xwe tîk dide, lê tim vê meselê bi kêmasî û zeafekî ji xwe re dibîne. Û hinek heval jî hene ku malesef viya tim dixin ber çava. Yanî tim tînin bîra wan.

Zahmetiya din, ji bo her penaberekî ne bi tenê paneberê siyasî, gava ku ji welatê xwe tî, ji nav miletê xwe tî, di emrekî de gelek zanîn wek sermiyanekî li ser hev komkirî ne bi yek derbê ve wenda dike. Gava ku tu tî derva divê tu



Umer Şêxmûs, sala 1980 li Kurdistana Iraqê li Tujala

tekî,
re bibe"


kulturekî nuh fêr bibî, zimanekî nuh, fêr-bibî, rewşekî nuh fêrbibî. Ji ber viya însanê penaber gava ku nuh tê welatekî, eyne wek zarokêkî nuh ji diya xwe bibe, gerek ji ewilde meselan fêr bibe û vava tesireke gelekî mezin li ser nefsiyeta wan dike. Çimkî ew li welat pirr aktîv e, pirr zana ye, kare di gel hemû tevgerên din ên siyasî û xeynî siyasî bi hêsanî û bi normal danûstandinê bike û tê de kar bike. Gava ku tê vir, xwe girêdayî dibîne, zimanê wî girêdayî ye, dixwaze tevgera xwe, rewşa xwe, miletê xwe, xebata xwe, ji xelkê re bahs bike, lê nikare. Nikare piştgiyariya wan û sempatiya wan bi aliyê xwe de bikî. Di çend salên ewilî de vava zahmeteke gelekî mezin e. Lê, xeynî wê jî gava ku diçe deran, diçe mektebê, gerek ji elîf û bê dest pê bike, diçe kar, kar bi dest nakeve; ji ber ku ziman nizane. Di gel cîranê xwe nikare danûstendinê bike, Diçe bazarê, her roj îşê wî li wir heye nikare. Hîsekî wilo li cem peyda dibe ku ne tiştek e. Yanî ew rûhiyeta însan bi carekê de dişkê.

Ji xeynî viya meselêkî din heye ku gelekî tesîr li însanê penaber dike. Ew jî

Yek, zarok zû fêrî ziman dibin. Dudu zû kultura vî welatî qebûl dikin, çimkî gava ku diçin mektebê danûstendina wan bi xortên yan keçên Swêdî ra zû çêdibin. Bi zimanê wan dipeyivin, zû tiştan têdigîhîjin û adeta wan distînin. Li malê kultureke din, ferhengeke din heye. A vava nakokiyek mezin li cem zarokan peyda dike.

kêmasiya statûsa însan e. Mesela li welat tu xwendeyî meslekekî te heye, tu ziman dizanî, mumkun e ku tu însanekî entelektuelî, xaniyê te heye, mumkun e ereba te hebe, mumkun e rewşa te baş be. Heta ku ev tiştana jî tunebin, di hêla moral de, di hêla manewî de tu gelekî dewlemendî, lê gava ku tê vira ji nişkêva digêhê statusekî ne tenê ya nizm, lê nizimtir û viya yek ji wan tesîrek gelek mezin li însanê penaber dike. Ji ber wê, gelek caran însanê biyanî û însanê multecî bi munasebet bê munasebet gava ku bi xelkê vî welatî re rûdine û dipeyve dixwaze tim nişan bide ku li welat ew tişt bûye.

Ya din gelek caran zahmetiyek peyda dibe. Ew li wir di nav kulturekê de jiyaye. Yan di nav kultura Kurd, yan di nav



Umer Şexmûs, Nawzeng(Kurdistana Iraqê), sala 1978,

kultura gelên Rojhilata Navîn de. Di gel ku hinek tiştên me yên taybetî hene ku bi kultura Kurdî ve girêdayîye. Lê sîstema sosyal nêzî heve e, tesîra îslamê li ser wan gişan bûye. Meriv bixwaze nexwaze hinek meseleyên siyasî dewir dîtine ku di gelek meselan de kultura wan nêzî hev bibe. Di mesela mêvaniyê de, di mesela cîranan de, di mesela rabûn û rûniştinê de, di mesela xwedîkirina zarokan de, di mesela dîtina jinan de, gelek mesele hene ku nêzî hev in. Dûra danûstendinên sosyal li wir gelekî zêde ne. Gava ku tê vira, li vir şoqek li cem peyda dibe, şoqekî ecêp zêde. Ew danûstendina fireh û sosyal ku li welat hebû li vir tune ye. Wextek jêra divê heta ku meriv heval û dost û nasan peyda bike. Gava ku meriv peyda dike jî tabîata van danûstendina ne wek ya welat e. Gelel cûda ye, ev yek.

Ya duduya, mesela danûstendina di gel zarok û pîrekan gelek cuda ye. Jin li vira azadtir e, wek hev tê muqayesekirin. Îcar însanekî gundî û ne xwendevan, li bajarê mezin ne jiya be, tu ji wî atmosferê gundîtiyê derxîne bîne li Swêd de, ji roja ewilî gava filmekî di televîzyonê de bibîne şoqekî mezin li cem peyda dibe. Diçe dukanekê rojnamekê dikire, suretên ecêp dibîne, vava hemû meselên sosyal û kulturî bi carekê de serûbinî hev dike. Ji ber vava wext jêra divê heta ku karibe vava kultura han fêr bike, qebûl bike.

Armanc: Baş e ferqên çandî, sosyal û ziman xwe li ser jin û zarokên Kurdan çawa dide xuya kirin?

U. Şexmûs: Ew ferqana meriv dikare di domîne jîyanê de bibîne. Yek, zarok zû fêrî ziman dibin. Dudu zû kultura vî welatî qebûl dikin, çimkî gava ku diçin mektebê danûstendina wan bi xortên yan keçên Swêdî ra zû çêdibe. Yên diherin mektebê bi emrê wan ra ne, bi zimanê wan dipeyivin, zû tiştan têdigîhîjin û adeta wan distînin. Li malê kultureke din, ferhengeke din heye. A vava nakokiyek mezin li cem zarokan peyda dike. Ku kultura mektebê û a malê li hev nake. Bav û dê gelekî zext lê dixin ku gerek kultura xwe wînda nekin. Bav û dê dibêjin, em ji miletekî wilo hatine, kultura me welê ye, gerek tu welê, welê bikî... Diçe mektebê mekteb tiştekî din jê re dibêje.

Armanc: Yanî meriv dikare bêje, mal, zarok dikî bîne mal, mekteb jî zarok dikî şîne nav ciwaka Swêdî...

U. Şexmûs: Belê, ev yek ji wan meseleyên ku gerek meriv li ber çavê xwe bigre. Paş cîlê duduya, cîlê sisiyan zarokên me êdî ne zarokên me ne. Yanî gerek meriv viya li ber çava bigre. Cîlê sisiyan asimîle dibe. Hinek lêkolînên ilmî hene ku dibêjin asimîlasyona

Paş cîlê duduya, cîlê sisiyan zarok êdî ne zarokên me ne. Yanî gerek meriv viya li ber çava bigre. Cîlê sisiyan asimîle dibe. Hinek lêkolînên ilmî hene ku dibêjin asimîlasyona dawî paş cîlê 5'an dibe. Lê bi rastî heger meriv lê binihêre paş cîlê duduyan, di cîlê sisiyan de êdî entegrasyon û asimilasyon dest pê dikin. Zimanê xwe wenda dikin, kultura xwe wenda dikin, bi temamî kultura wî welatî qebûl dikin.

dawî paş cîlê 5'an dibe. Lê bi rastî heger meriv lê binihêre paş cîlê duduyan, di cîlê sisiyan de êdî entegrasyon û asimilasyon dest pê dike. Zimanê xwe wenda dikin, kultura xwe wenda dikin, bi temamî kultura wî welatî qebûl dikin. Ev li alîkî, li aliyê din, di nav malê de di gel ku bav û dê heta ku ji destê wan tê dixwazin kultura xwe, zimanê xwe bidin zarokên xwe. Lê bi ser nakevin prosekî ku nikarin rê lê bigirin. Dudu: ji ber ku strûktura sosyalî ya vî welatî, welatekî endusturiyel e, welatekî pêşketî ye. Ne welatekî zîraî ye, ne welatekî gundî ye, ev proseya jî gunda hatina bajara ji sala 30'î û virde dest pê kirye. Û gihaye dercekekî ku niha ji % 80'ê xelkê Swêdî li bajaran dijîn tenê ji %17 li gundan mane. Însan anonîm dibe, danûstendinên xwe kêr dike. Malbata ortê, yanî jin, zarok, bav û mêr dibe esasê hemû danûstendinê. Ne wek cem me, bi dost û merivan re û cîranan re gelekî fire

nîne. Li wir gelekî normal e ku bi cîranê xwe re gelekî dost be. Tim hev û din bibînin, hemû wextê dikarin serî li hev û din bidin û alîkariya hev û din bikin. Lê li vir ne wilo ye. Çawa ji însanekî penaber re zahmete, ji însanekî Swêdî re jî ev tiştana zahmet in. Ji ber ku ew jî bi vava kultura han mezin bûye, pê xwedî bûye, fêr bûye ku paş seet 22 kes telefonê veneke. Fêr bûye ku heta yek pêşkêşî yê din neke meriv silavê li hevûdin nake. Fêrî wava bûye ku ji çûkanî da guhdariya xwe bike. Tabî gelek mesele hene ku meriv dikare rexna wan bike, lê vava kultura wan e, ferhengawan e, di gel wê de mezin bûne. Gerek meriv fêr bike ku zahmetî ji wan ra jî di vava meselê de heye.

Yek ji wan meseleyên ku li vir, di jiyanê civakî gelek lêkolînên ilmî hatine kirin, li ser mentalîteya Swêdiyan yanî li ser qerekerê Swêdiyan. Yek ji wan stûnên gelek girîng di vî warî da, xwe dizî ji konfliktê (lecêyê). Swêdî hez ji konfliktê nakin. Gava ku konflikt jî peyda dibe xwe jê didize. Ev perçekî girîng e di kultura Swêdiyan da. Kultura me ne weha ye. Ne tenê ya me, ya gelek miletên din ên cîhana sisiyan jî. Bilakis mirov li dû konfliktê digere. Yanî mirov konfliktê wek perçekî di jiyanê de dibîne. Ji ber viya jî konflikt ji mirovan re ne tiştekî ku mirov jê bireve. Lê li vir ne waye. Wek motîvekî, wek numûneyekê peyda bûye ku meriv çawa dikare konfliktê hel bike. Mesela di civînan de çiqasî dîtinekê li dijî dîtina te bibêje, nabêje ez qebûl nakim. Dibêje ewa dîtina te ye, lê dîtina min wilo ye. Gava ku dibîne xelkê biyanî bi hawekî din, bi hawekî hîsî munaqeshe dikin, bi wan werê ku şer dikin.

Di wê mesela ku bi hev û din re napeyivin de çend mesele hene. Di vava meselê de mirov dikare bi hustuyê sosyal demokratî bigre. Ew jî di salên 30'î û 40'î de îdeolojîyek peyda bû, ku gerek mesela xanî bê hel kirin û her malek gerek xaniyê xwe hebe Û di nav xanîde jî gerek her zarokê oda wî hebe. Eviya dibe domênêkî xusûsî ji wî ra. Û gelekî li ser kar kirin jî. Netîca wê bû çî? Netîca wê bû ku her însanek bi xwe bû keleyek di oda xwe da. Yanê refahê bi xwe, alîkî negatîf bi xwe re anî. Aliyê negatîf çî bû? Danûstendinên sosyal di nav xelkê de mirand, kêr kir. Êdî ihtiyaca xelkê ya aborî bi hev ra nema. Gava ku tu zarok bî, dewlet te xwedî bike, neku diya te û bavê te. Bilakis zarok qezenc e ji dê û bavê re vêrgiya wî kêr dibe, alîkariya zarok distîne, alîkariya xanî distîne. Yanî, di dêvla ku li ser bav û dê bibe bar dibe qezenc ji bav û dê re. Ji ber viya, zarok wexta ku li vir mezin dibin, ji ber dewleta "refahê" dibîne ku komel û dewletê ihtiyaca wî ya esasî û hebûna wî temîn kirye, ne ku dê û bavê wî. Xwendina wî jî li ser dewletê ye. Û gava ku mezin dibe, tu mecburiyet, yan jî hezkirin bi wacîbe kî li hember diya xwe û bavê xwe nabîne. Ew yek. Ya duduyan: Dewleta refahê gava ku însan bê kar dibe, hinek ihtiyacên wî yên esasî temîn kirye. ihtiyaca wî nemaye ku li birayê xwe, li diya xwe, li xalê xwe, li merivê xwe doza alîkariyê bike.

(Dom dike)

Çîrok

Diz

M. Elî

Di kuça tarî û teng re derbas bû û li ber deriyê xaniyê nizmî kerpîç sekini. Qederê çavê xwe yê hûrî şil, li ser kuliyên berfê ê ji jor da dihatin xwarê gerand. Dûvra, lingên xwe di berfa erdê da û di deriyê nizm re derbasî hundir bû. Li hundir ronahîkî qels hebû. Agirê lembê ê ricifokî şewqa xwe bela dikir û di diwar de hin xekekên siyê ên lerizokî çê dikir.

Çavê wî cara ewil bi kurê wî ê di bin mitêla peritandî ya nêzî kuçik raxistî ket. Dûvre ber bi jina wî de bilind bû. Çavê wan bi hev ket, lê debar ne kir, çavê xwe ji ber çavê jina xwe revand. Serî di ber da, hêdî hêdî ber bi quncikê xanî ê parî tarîtir ve meşiya, çû li wir rûnişt. Qasekî din, bi siya hêdî hêdî ber bi pê de tê, serê xwe xist nav herdû çogên xwe û çavên zoqî piçikên berfê ên li ser pêlava xwe kir. Jina wî, bê deng hat li nik wî rûnişt. Demekê dirêj, bê deng wilo li nik hev sekini. Pişt re dengê jina wî ê nizmîk, wek ji kûr de bê, ket guhê wî:

"Gelo dîsa vala vejeriyayî?"

Wek xwe bi xwe biaxive, di ber xwe de bersîva jina xwe da:

"Erê vala. Wek her gav" Hinekî sekini, pişt re dîsa dest pê kir, wek bixwaze kula dilê xwe birevine. "Ev çend roj in, sibê zû ji malê derdikevim, dibêjim dibe ku ez kesekî xwedî bar bibînim... Heta êvarê, li istesona tirênê, li xeracên makîna, li xana û kuça beredayî digirim. Kesên xwedî bar ên tîn û diçin, tu kesî ji naxwaze bi me bikşinin. Kî bê, ya barê xwe li erbeba hespa dike, yan jî li teksîkî siwar dibe diçe. Hela piştî barîna vê berfa pirr, ez li wan der û doran ji çend himalên wek xwe pêştir tu kesî nabînim. Di vê berfê û sermayê de karê xelkê tune wê derdê himala bikşîne? Ne hewcî dirêj kirinê ye wek min go, heta êvarê em vala digerin".

Demekê peyv ji devê kesî der ne ket. Pişt re dîsa jina wî bi dengê nizmî dest bi axaftinê kir.

"Tu bigeriya, dibû ku te ji xwe re karekî din bidîta. Bivê nevē karekî li gora te jî wê hebe".

"Ji te tirê ku ez nagerim qey? Qey, ez bê serî li kuça digirim?... Elbet ez jî alikî de jî li kar digirim. Lê karê çî, halê çî... Êdî buye ku bi bertîla jî kes nikare tu karî bi dest xwe xe." Hê axavtina xwe xelas nekiribû. Lê nihêrt çîqa diçe girî dikeve çavê wî û qirik lê ziwa dibe, dike nake nikare xwe ji vî halî xelas ke, dengê xwe birrî. Lê hêsirê çava ne girt, nermîk nermîk hatin xwarê. Jina wî piştî van gotina tu bersiv lê ve negerand, ji nik wî rabû, dîsa çû li ciyê xwe ê berê rûnişt. Piştî çend deqa, li kêleka lawikê piçûk vezeriya û di xew re çû.

Heta sibê xew ne ket çavê mîrik.

Çavê xwe bal bi agirê lembê yê zelûl ve kiribû û diramiya. Carna ji xwe ve diçû û diket xeyala. Lê pir ne dima ku xeyalên wî diçûn dihatin, dîsa li ser agirê lembê ê zelûl disekini. Zelûlbûna lembê hin xekekên siyê di diwar de çêkiribû. Van xekekana, pêde wek guliyê darê li ber bayê dihejyan û kederek biyani dîxistin dilê wî. Diwarên bê deng û siyên lerizokî, mirinek sar dîxistin bîra wî. Wê gavê, temamê laşê wî bi tirs diricifî... Carna çavê wî ber bi lawikê di bin lihêfa peritandî de razayî ve dibû, pişt re diqelibî ser jina wî. Çavên lawik ketibûn kortê, di rûyê wî de jî hestû û çermîk pêve tu tişt ne ma bû. Bi hestyê xwe yê zeyîf û ziravîk wek mirov îskeletêkî ji mezêl(gorê) derxistîbe û danibe wir.

Tiştê ku bi şev dihat bîra wî û li ser diramiya-piştî ku rê ne dida ber- hê bêtir kulê wî radikirin û ew bê hal dîxist. Mirov digot qey şevêkê, bîst sal bi carekê de ew extiyar kiriye.

Bi dengê kuxukek ji kûr de tê li xwe varqilî. Çavê xwe ber bi paca piçûk a naylon ve bilind kir. Li derva bagerek mezin hebû. Kuliyê berfê ber bi bayê ketibûn û virda virda difiriyan. Ji alikî de jî, misêwa naylona pacê dikutan. Ronahiya ku di naylon re derbas dibû û diherikî hundir, dida xuya kirin ku êdî sibe bûye.

Carekê lê hay bû ku dengê kuxikê hê dom dike. Li alî deng vejeriya. Jinikê lawik bi ser zik ve danibû ser çonga xwe, serê wî bi ser kuçukê agirê vala de xwar kiribû û ji bo kuxik bisekine, hêdî hêdî li piştî wî dîxist. Lê dikir ne dikir, kuxik ne disekini. Her ku diçû zêdetir dibû û pê re jî qirik li lawik dixetîmand. Di wir de bi cih dibû û bihna lawik diçikand.

Ji nişka ve çavê wî ên ku zoqî lawik bibûn ji hev bûn û bi tirs li hev geriyan...Ew çî bû?...Tiştê ku didit gelo rast bû?...Pêşiyê ne xwest bawer bike Dûvre nihêrt ku rast e; xwînek sor zirav bi kef û belxema devê lawik re dihat xwarê. Xwîn wek takî sor dirêj dibû û dûvre li erdê di nava belxemê bela dibû. Her ku diçû ruyê lawik soro moro dibû, çavê wî ji hev dibûn û qapaxê çava di werimîn. Bi dengêkî bê umîd û bi nalîn di ber xwe de go:"Yarebî, ev çî hal bû hat serê me, ezê çî bikim?...Bi ku de herim?..."

Jinik jî mabû heyrî. Çavên wê yê mehzûn û bi hêsir jî bi carkê de guhiribûn, bûbûn mîna çavên pilinga har. Herdûkan jî nizanibûn wê çî bikin. An bi kude biçin. Lê jinikê debar ne kir, bi çavê xwe yê sor û şil li mîrik vejeriya û bi ser de qîriya.

"Bese, bese, êdî ji derdê te.. Çiye tu

ketiyî wî quncikî?... Halê lawik na binî?...Çî disekini, li benda mirina wî yî, çî?..."

Didit, baş jî didit. Lê dikaribû çî bikira? Bê pere bû, bê çare bû. Bi vê rebeniya xwe ka wê bi ser kê de biçûya, wê ji kê re bigota çî? Dêrdê xwe wê ji kê re vekira? Hima kê wê guh bidanayê? Na... na... tu kesî jî ji halê wî wê fêm nekira. Bi dengêkî wek ji kûr de bê, got:

"Ez dibînim, dibînim lê, bi serê xwe ka karim çî bikim? Qurîşek pere bi min re ne maye. Perê mitêla ku me wî çendî firot jî ne ma. Ka di hundir de tiştêkî firotinê ku hebe em bifroşin jî tune ye. Ne êzing e, ne dan e, ne xwarin e dîsa. Dixtor û derman ji xwe pereki gelek pirr divên. De ka bêje îca ez ê çî bikim?"

Lê guhê jina wî ne li wî bû:

"Hero duro, tîyî dike vî quncikê tarî, serê xwe dixî nav çogên xwe û wer difikirî. Ka çî dikeve destê te?... Tu dibê qey wê xwedê her tiştî ji taqê bibarîne?... Yan tu dibê hema çî dibe bîra bibe? Tu li benda mirina me yî, dixwazî em di nav vî mezêlê cemidî de biceximin herin?...Haa?..."

"Ka ez karim çî bikim? Heydê tu bêje, dixwazî çî bikim?"

"Çima ezê bêjim? Bi vê kevnejiyê xwe ezê aqil bidim te? Çî difikirî tu jî xwe re bifikire."

"Ez nikarim tu tiştêkî jî bifikirim. Ji xwe ev çendekî ye serê sibê, radibim, diçim digirim, heta êvara, nivê şeva... Ha virda ha virda... Lê tu tişt bi destê min nakeve. Loma. van roja ne aqil di serê min de maye, ne jî teqet di canê min de. A, niha gund bûna, dîsa me karibû li vî alî xwe bavêta hineka; nasîti, cîrantî...dibû ku rîk ji mer vebûna. Lê bajar?...ne nas e, ne dost e...Kî bi kê ye? Yekî ku kar pê bê, ne ez kesî nas dikim, ne jî qe... Tu deriyê vekirî na binim. Dest û ling li min hatin girêdan."

"De tu na fikirî, ez jî na fikirim. Eman êdî ji derdê vî lawê teyî me rezdarî. A, ji te re, tu lê binêre, çawa dikî, bike..."

"Hela hişê lê, xwedê jê razî..."

"Çima ezê hiş bim? Ez jî ne insan im, ne dê me? Qey, ezê heroj heta êvarê, bê umîd li benda mirina wî bim? Êdî ez nikarim debar bikim. Debar û taqet di min de ne ma."

"De hela bes e lê..."

"Ne bes e, çima wê bes be? Heta ku wê di vî halî de be, bigre bavê derva, bîra rokî zûtir bimren çêtir e."

Hêrsa wî rabû û ling bi ling zêde bû. Her axaftinek jinikê wek tîrekê di mêjiyê wî ra ke; diçûn di hundirê mêjî de diçikiya. Dilê wî teng dibû. Her ku çû çavê wî tarî bûn, serê wî gêj bû, digo qey diwar ber pê de tîn, ha dikin bi ser de hilweşin. Bi carkê de bê hemdê xwe ji ciyê xwe pekiya. Bi ser jina xwe de qîriya:

"Bes e !... Bes e dibêjim ji te re !... Ecela te hatiye, çiye?"

Jinikê jî xwe ne xwar:

"Erê, ecêla min hatiye...na besim, ezê bêjim. Heta nika ez sekini, ez hiş bûm ka çî bi destê

min ket? Salê min di vî halê xirab de..."

Debar ne kir, êriş da ser jinikê. Destê xwe bilind kir û heta jê hat kulmek li jinikê da. Bilind kir dîsa lê da. Lê jinikê dengê xwe ne dibirî. Her ku lê dîxist diaxft, her ku lê dîxist diqîriya:

"Li min xe, hema heta ji te tê li min xe...Lê tu nikarî êdî dengê min bibirî. Heta ku ezê di vî halî da bijîm, ez bimrim çêtir e. Qey ji te jî û jî lawê te jî xelas dibim. Lêxe...bikuje, bîra ez bimrim..."

Ji lîxistinê milê wî betilî, êdî mest bû. Sekini, bi çavê sorê xwînî li dora xwe nihêrt. Çava wî tu tişt ne didit. Diwarên dora wî wek kekekên ser pêlên avê diçûn dihatin.. Gêja wî çû, xwe li er linga ne girt, wek xirarekî vala qelibî bin diwar û wer ma. Ji xwe çû. Êdî ne kuxik, ne jî qîrîra jinikê ...Tu deng ne diçû guhê wî.

Gava bi hişê xwe hat û çavê xwe vekir, li derva tarî ketibû erdê. Hêdî hêdî ji ciyê xwe rabû. Êşek giran ketibû serê wî, dîsa gêja wî çû. Ji bo ku ne keve, pala xwe da diwar. Hinekî wer sekini, pişt re nerme serê xwe bilind kir û bi çavê vala li dora xwe nihêrt. Pala xwe ji diwar hilda, berê xwe da ber bi paca naylon û meşiya. Bi piştî destê xwe li naylon xist, berfa derva ji ser qewitand. Demekî derva temaşe kir. Bagera serê sibê sekini bû. Şev bê deng bû. Li derva ronahîkî ji ronahiya berfê hebû. Li der û dorê, ji berfa sipî û di nav wê de hin reşê malên wek a wî pêştir tu tişt xuya ne dikir.

Ji pacê vejeriya, serî di ber de, xwe bal bi derî de kir. Derî vekir, derket derva û ket kuça teng.

* * *

Berf, bîstikek berê sekini bû. Lê tevî berfa ku ji sibê de hatibû, ji çogekê zêdetir berf ketibû erdê. Bi sekina berfê ba û bager jî sekini bû. Lê ji ber ku dinê sayî bû sermakî îşk peyda bûbû. Wek cilêtek tûj ser çavê wî dibirî vê sermê. Debar ne kir, şewqê xwe xist nav çavê xwe û stukira çakê bilind kir li dora histûyê xwe pêka. Destê xwe yî cemidî xist bêrika pantolonê xwe û meşiya di nav berfa pir de.

Heta çogê diket berfê û derdiket. Weka ku ne xwaze çavê xwe yî şil nişanî xwedayê ku dilê wî pê naşewite û duayê wî qebûl nake bide, serê xwe bi ber xwe de xwar kiribû. Berfa hişk û cemidî di devdelingê pantolonê wî yê qetandî re diket hundir û wek parçên camê çimê wî dibirî. Digo qey temamê laşê wî dike bitevize. Lê qet guh ne didayê. Dibe ku haya wî jî jê tunebû. Bi rastî hay li tiştêkî jî nînbû. Nizanibû bi ku de diçe û çima diçe jî... Hew hay lêbû ku ji mala xweyî bi rojan e ku nan û agir ne ketiyê dîr dikeve. Her gava ku davê ew ji vî mala wî ya sar, lê a bi sala ye sitariyê li serê wî dike dîr dîxist.

(Dom dike)

helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest


Sebrî Botanî

Sebrî Botanî helbestvanekî ji xelkê Botan e û ji Kurdistana Iraqê ye. Wek di pêşgotina diwana xwe, "Şîn û Şadî" de daye diyarkirin, ew di sala 1944'an û vir de helbestan re jiyaye. Helbestên xwe yê pêşin di sala 1946'an de di zindanê de nivîsiye. Du dêwanên wî, "Şîn û Şadî" û "Dilistan" di sala 1988'an de li Stockholmê bi tipên latînî çap bûn. Em çend helbestên wî şairê heja û welatparêz li jêrê pêşkêşî xwendevanê xwe dikin.

Sebrî Botanî

EY KIÇA KURD

Ey kiça Kurd zû hilo derkev ji gov
Lez bixwîne baş bibîne da nemîni niv mirov
Ma ne şerme her bimîni bê amanc û bê dirov?
De hilo rabe ey delalê tu nebî şîn nabit tov
Bo tovê jîna welatî bê guman her tu yî şov



GULA ZÎZ

Boçî ey delalê
Dîsa ev gul
Maye zîz?!
Ew bihara geş xemilî
Dîsa li me
Kir peyîz

Hiş û bîr û dil û can
Tev bi carek
Wê dizî
Te dî çawa dîlo jaro
Beko ji ber alizî?
Eve ez çûm jaro dîlo
Pirozkim
Sersala wê
Şabe ey dil
Min û xwe bike gori
Bejîn û bala wê

Nav û dengê doza gulê
Li cihanê
Deng veda
Di govenda vê carê da...Naminin
Şa û Geda

BAWER BIKE

Bawer bike ev saleke
Jîn û mirin nik min yeke
Rabe gulê biskan şeke
Çerx zivirî hat feleke
Vê delivê ji dest neke
Ez xulamê xo berevke
Evingehê li min veke
Ne bêje eger û heke
Jîn kurte, şev û rojeke
Ger piçeke ger geleke
Ez şikestî me, min ji bîr neke
Ez bê kesim min ji bîr neke

WERE WERE

Were were şox û şengê
Te ez kuştim perî rengê
Erê gulê heta kengî?

Heke raste evîndarî
Ji dil wek min birîndarî
Boçî hinde ne guhdarî?

Were were sebra dila
Hey tac û nişana mila
Janê de cergê bilbila

Bi wî dengê nerm û rewan
Awazê bibil û kewan
Dil ji min bir gula ciwan

Ji awazê germ û zirav
Bibarîne misk û gulav
Belav bike pirs û silav

BIHARA WELATÊ MIN

Bahoz û bager û baran
Neman, çûn û welat berdan
Befra sipî rewşa ciwan
Li ser serên çiya hêlan
Nema êdî mij û moran
Bi şîn û girî revî zistan
Geş bişkivî rengê cihan
Xweş xemilîn mêrg û zozan
Bi nêrgîz û gul û rihan
Dema rengin cejna zeman
Li her cihî keyf û seyran
Çiya û solav, bax û bistan
Mîna behîştin bê guman
Bang û awazên bilbilan
Hiş nahêlin bo sorgulan
Ev nêr û mî ji hemî rengan
Bi dilşadî dikin dilan
Nemaze Nûroz û Nisan
Hey aferîn ji bo yezdan
Her ava bit cihê Kurdan

Gundê Hiror
Nûroza 1962

Helbestên Xwendevanan ▼ Helbestên Xwendevanan

HELEPÇE

Bihar e dema qulinge berdaye berba dibe
Xema wîna nîne xaino ku halê min çî ye

Ku çile lê tê ew direve ber bi germeava ve
Ku bihar tê germ tê bi qîrîn û awaz ve.

Dinya min betal e ku ez bê saz û awaz im
Xewa min tine serbest ku carek ji xwe re razim

Wê êş û jana min dom bibe ta kû ev dil be lo
Keko ez sersar û gêjim ku li bîra min e do

Perê min tine bifirim van kulû xema bavê
Bihara teye qûrr qûrro guhnadêre dilê min

Her yek me li derek ber tofan wêran be Helepçe
Dijmin çar, ez sed parçe bi kîmyayî jahr Helepçe

Saniyek de mirin deh hezar,
em li dev dinêrin wek mar
Şivan dar bi deste li male pez berdaye şihar

Dipirsim ka pez dikeve çiroka par û pêrar
Şivan gura pez xwar dibê ev çiroka me ya her car

Ta şivan dar bi dest li mal be halê ne ti hal be
Quling bi qeb saz be me dî wê biyan û jar be.

Evîn û Welat

Di hêviya ditinê de
Ji ba hev diçin evîndar
Ta ku berdeyam be evîna wan
Lê va ez diçim yarê
Bê ku ji te bipirsim sozê
Ji ber min soz heyê
Bi xort evînekê re.

Eger hezkî werî
Cigeha min ew...
xaka şewitî
axa bîndest,
kela berxwedanê
Ramosan eger te şandin yarê
Navnişan... şoreş e.

Evîn êdî ne ji te tenê re xeza-
lê
Min gelek yar hene, îro, de-
lalê

...xebat
berxwedan
û tîfing

Ji geleka ez hez dikim, îro,
ji Kurdistan
...Havana
Qudsê
û xwîna ku rengin dike alê
Evîn nema, ê min ji te re
Ew biriye... Leyla
Margerêt
û Tanya

Lê zanibe yarê
Kû wê vejyan be dil
Û dayik bibe evîna min
Wek cewiyekî ji aşitîyê re

Eger çuyina min bê vegeer be
Êdî tu min namîni,

kû tu werî ji
Wê gavê megrî yarê
Rondika mebarîne hevalê
Ango bangkin bi dengê bilind
Kû li bédengiyê biçire diwar
Û bêjin: Berxwedan jîyan e.

Kamiran/Yûgoslavya

Pasa ve Hîrê Lazûn a

Arêkerdax: Usxan

Welatê de pasayê (yew paşa) beno, hîrê lazê(lajê) xo benê. Rozê pasa vanda lazûnê xo dano, ci rê wesîya xo keno, vano:

- Bikênê, roze yêna ez gin-en piro(puro) miren. Na koyê serê ma ro meşêrê.

Emrê Haq(Hûmay) yêno, pasay gineno piro mireno. Lazê pasay anê verê sarayê de hîre herîgo(horigû) nanê ro(ru). Lazê pîl rê beno derd, urzeno ra vano:

- Ala(Hela) ez na koy ser o şêrîne, çik na serê koy ra esto, na piyê ma ça niya va?

Kuno ra raye sono, zof(zaf) ke sono senik(tey) ke sono, rastê(rastê) mordemê(merdimê) yeno. Pers keno, vano:

- Şuwane cêna(gênî)?

Mordemek vano:- Cên ama şertê mi estê. Eke şertonê mi qevul(qebul) kena mi di bê.

Lazê pasay vano:- Şertê tu (to) çik yê? Ala mi ra vase.

Mordemek vano:- Şertê mino virên: citê gawû(gayan) fîn ra tu ver, tajîya(taziya) mi ke kot(kotî) kote ro (rokewti), tu gereke ûza(wica) biramê. Şertê mino diyine: cariya mi tu rê nû(nan) û most(mast) ana. Nû bûye (biwere), gil(kiştî) mesikne (meşikne); most bûye, ame(amên) mesikne. Şertê mino pêyên: meqariye. Kam ke qarîya, mîyanê(maney) dey ra çerme (zoli, zelê çarixû) vezeme, qevul kena?

Lazê pasay vano: -Qevul ken.

Sonê çê mordemekî. Mordemek **soder**(serê sibay, ni-majî) urzeno ra citê gawû fîno ra lazê pasay ver, vano:

- Tajîya mi ke kot kote ra, ûza birame.

Lazê pasay urzeno ra, gawû fîno ra xo ver, kuno ra tajîye ver, sono. Tajîye sona kemere ra kuna ro(rokuwena). Lazê pasay bese nêkeno (**nîkeno**) biramo. Şiya(Seya) dare de nise-no ro(roşeno). Cariya mordemek ci rê nû ve most a ana. Lazê pasay gilê nûnî sikneno, **amê most**(mastî) kî sikneno, xo keno mird. Son de gawû cêno yêno çê. Mordemek ci ra pers keno, vano:

- Tu qarîya?

Lazê pasay vano:- Çi meqarîne? Hen qarîne ke bîne le-tey.

Mordemek çerme mîyanê

ney ra vezeno, lazê pasay kişeno. Herîga lazê pasay **permelîna** ro. Na fa (fin) kî (zî) birayê hortî vano:

- Ala ez şêrîne, na birayê ma xeyle wext o şiyoy, towa ci ra xevere nêvejiye. Herîga dey(jey, yê, ci) kî ha wa permeliye ro.

Urzeno ra, koy ser de sono. Zof ke sono senik ke sono, rastê mordemek yêno, Vano:

- Şuwane cêna?

Mordemek vano: -Cên ama şertê mi estê. Eke şertonê mi qevul kena, mi de bê.

Lazê paşay vano: -Qevul ken.

Mordemek **te** sono çê **mordemek** (mordemekî). Mordemek vano:

- Şertê mino virên: citê gawû fîn ra tu ver, tajîya mi ke şiyoy kot kote ro, tu gereke ûza biramê. Şertê mino diyine: cariya mi tu rê nû û most a ana. Nû bûye, gil mesikne; most bûye, ame mesikne. Şertê mino pêyên: meqariye. Kam ke qarîya, çerme mîyanê dey ra vezeme.

Lazê pasay qevul keno. **Soder (sodir)** urzenê ra, mordemek citê gawû fîno ra ver, tajîye kî verdano ra. Lazê pasay gawû cêno kuno ra tajîye ver, sono. Tajîye sona gilê kemere ra kuna ra. Lazê pasay bese nêkeno biramo. Cariyeyê ci rê nû û most a ana. Lazê pasay nû weno, gil sikneno. Most weno, amê sikneno. Son de gawû cêno yêno çê. Mordemek vano:

-Tu qarîya?

Lazê pasay vano: -Qarîne ke se vajîne!

Mordemek çerme mîyanê ney ra vezeno, ney kî kiseno. Herîga lazê hortî kî permelîna ro. Birawo **qiz** (qij, werdî, şenik) niyadano kê herîga birayê hortî permeliye ro, kuno rayeyê, koy ser de sono. Zof ke sono, senik ke sono, rastê mordemê yêno. Mordem ra vano:

-Şuwane cêna?

Mordemek vano: -Şertê mi estê, eke şertonê mi qevul kena, mi de bê.

Lazê pasay vano: - Şertonê tu qevul ken.

Mordemek şertonê xo birayê qiz ra kî vano, piya sonê çê. Soder mordemek citê gawû fîno ra lazê pasay ver, tajîye verdano ra. Lazê pasay gawû fîno ra xo ver, kuno ra tajîye dima. Tajîye sona gilê kemere

ra kuna ro. Lazek kî şiya dare de linge erzeno linge ser, kuno ra. Niyadano ke carîya mordemekî nû ve most a ard. Nonê xo weno, pê carîye kî kay keno; gawû kemer ro erzeno, **kilamanê** (kelmanê) nîrî sikneno, son de **darîno we** yêno çê. Mordemek vano:

-Tu qarîya?

Lazek vano: -Nê, nêqarîne. Mordemek **cina** xo ra dijî(dizdî) ya vano: -Son de urze, tenê nû poze (pewje), ma ney ca verdîme, şime.

Lazek pêyê **ondal** de gos dano.

Cinike **nonê tewa** pozena, bena kena sandiqe. Lazek kî sono kuno sandiqe. Sandiqe se ro kilit kenê, ver va (bi) soder kunê ra raye sonê.

Zof ke sonê senik ke sonê, rastê dewê yêne. Kutikî cênê nîne ra, mordemek vano:

-Ax nika û şuwaney ma **tika** (tiya) **viyênê** (bîyênê), ma na kutkû ra bixelesnênê.

Aye de lazek vano:

-Ez o zerê sandiqe de!

Mordemek **lazek** (lazekî) sandiqe ra vezeno, lazekkutkû her jû nano ra ceye. Hîremêna kunê ra raye sonê, rastê **korpîyê** (yew pirdî) yêne. Korpî ser o kunê ra. Mordemek cina xo ra vano:

-Ma gereke son de ney berjîme (bierzê) uwe (awi).

Lazek **ayîq** (haya) beno, **hesneno** (eşnaweno). Mordemek ve cina xo ra piya kunê ra, lazek kî tîyna kuno ra. Son de **letê** (tikê) sono, mordemek erzeno koseyê kuno virara **cinike**. Ver va (bi) soder cinike vana:

-Urze, ma lazekî berjîme uwe.

Nêzona ke **lazek** cayê xo vurno (bedelnawo).

Urzenê ra, sare (sere) de cinike cêna, lingû de lazek cêno, mordemekî erzenê uwe.

Soder cinike urzena ra ke virar de lazek o. Vana:

-Mêrdê mi **ku**(kû) yo?

Lazek vano: -Ma tu son de va ke "urze berjîme uwe", ma kî guret (girewt) est (eşt) uwe.

Lazek cina **mordemek** (mordemekî) cêno, **hêfê**(heyfê) birawûnê xo kî gureto, sono reseno muredê(miradê) xo.

Vatox: Simaylize
Tarix: 1985

DEYÎRÊ MA

Arêkerdax: Malmîsanîj

HUZNA

Wî day, wî day, wî dayê; wî dayê, wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê; bay to bimro Huznayê.

Ez ha şina eskero, wî dayê, wî dayê
Ez ha şina eskero, wî leyro, Huznayê.

Kom ku Huznay mi bero, wî dayê, wî dayê
Kom bero ez kişeno, wî leyro, Huznayê.

Êro hot o, hot o hot o; wî dayê, wî dayê
Êro hot o, hot o, hot o; wî leyro Huznayê.

Keçel'i Huzna remnawa, wî dayê, wî dayê
Dere w cere çarnawa, may to bimiro Huznayê.

Qasidî Huzna ca kerda; wî dayê, wî dayê
Dewa Cêrîni di ca kerda; wî leyro, Huznayê.

'Elî Şem'i malê xwi roto, wî dayê wî dayê
Tifingo mawîzer giroto, wî leyro Huznayê.

Pê ra Keçel'i dim koto, wî dayê, wî dayê
Pê ra Huzna dim koto, wî leyro, Huznayê.

Şexmîran* di ca kerda, wî dayê, wî dayê
Şexmîran di ca kerda, wî leyro, Huznayê.

Baxirî (Barixî) gironî werîştî(werzenê), wî dayê, wî dayê
Pê ra Huzna dim kotî, wî leyro Huznayê.

Pê ra Keçel'i dim kotî; wî dayê wî dayê
Pê ra Huzna dim kotî; wî leyro, Huznayê.

(* Şexmîran: Dormarey Liji di yew dew a.

HEVALÊ

Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê *
Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Na(Ena) hevala mi qey bermana?
Na delala mi qey bermena?
Hesronê xwi (xo) gurgurnena
Hesronê xwi gurgurnena.
Pê desmali(dismali) esterena
Pê desmali esterena.
Bara(Para) zamê şirawena
Bara zamê şirawena.

Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Bakê(Bawkê) xwi ra fedî kena
Bakê xwi ra fedî kena.
Dayka xwi ra cêz (cêzi) wazena
Dayka xwi ra cêz wazena.
Pê zerdon qayil nêbena
Pê zerdon qayil nêbena.
Serê bonê bakê bûki hût o
Binê bonê bakê bûki hût o.
Henê **vêwe** alawito
Henê vêwe alawito.
Bara zamê şirawito
Bara zamê şirawito.
Destê zamê ma sawito
Destê zamê ma sawito.
Serê bonê bavê bûki bilind o
Binê bonê bavê bûki bilind o.
Bavê bûki axayê gund o
Bavê bûki axayê gund o.
Digerrîne mûm û findo
Digerrîne mûm û findo.

Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Day qurbanê bûka malê
Day qurbanê bûka malê.
Şekerê sor e nav desmalê
Şekerê sor e nav desmalê.
Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê
Ex lê, lê lê; lê lê, lê lê.

(* Na deyîri (dêri) zey vatişê yew dewijê dewa Xasor'i (Yalmlî) nusiyayaya.
Xasor, qezay Liji ser o ya.

Dûmahîka xeberan ▼ Dûmahîka xeberan

Bawerî ji çekên kîmyayî jî xurttir e

"Pêşmergan li eskeran xist", "Pêşmergan serî hilda", û h.w.d. Rojnameyên Tirk qampaniyek wisa vekirin ku, hayhewar!

Lê ya ji êrîşên rojnamên burjuwazî jî muhîmtir, li hember multeciyan siyaset û muamela dewletê bi xwe ye. Çaxa meriv bala xwe dide axaftinên kesên berpirsyar û bûyerên ku di qampan de dibin, meriv dibê qey van kesên hatine ne multeciyan siyaset ne, wek ku di destê dewleta Tirk de êsîrên herbê bin. Bi hawakî eşkere muamela êsîran bi wan dikin. Ne dihêlin ku ew ji kampên xwe derkevin û ne jî kes biçe ba wan. Scrok û berpirsyarên pêşmergan top dikin, bi rojan wan di qereqolan de digrin. Yê li dijî vê neheqiyê derkevin jî, ji alî polis û leşkeran ve têt lîxistin.

Ya din jî, wek têt zanîn Tirkîyê doktorên Yekîtiya Neteweyan re jî musade nekir ku multeciyan muayene bikin. Ev jî nişana hevalbendiyê Seddam e. Van kirinên rejîma Evren û Ozal jî nişan dide ku ew, çuqasî "humanîst" in û hurmeta wan ji maf û huqûqê însanan re çuqas heye.

Rast e, tevgera Kurd li Kurdistanê Iraqê bi vê êrîşê derbak xwar, lê çî ji alî qewet û çî jî ji alî moral ve neşikiya, qels nebû. Îspata vê jî moral û qerardariya pêşmergan e; ew di qampên kolonyalîstan de jî dibêjin "Bijî Kurdistan, Bimre Seddamê faşîst". Nimûneyek din, ji multeciyan pirs kirin, kî dixwaze here Ewrûpa û welatên din. Ji nav 100 û 120 hezar însan li dora 1000 kesî xwestin ku herin Ewrûpa. Ev jî bawerî û qerardariya gel, bi têtkeşîn û bi şoreşê nişan dide.

Çaxa meriv hinekî bi firehî li meselê binêre, meriv dikare bibêje ku, tevgera Kurd bi tevayî piştî vê êrîşê hîn jî xurttir bû. Li berxwedana gelê Kurd ji serê çiyayên Kurdistanê, ji her demê bêtir daket qada siyasetê cihanê. Ev jî ji bo hella meselê pêşketinek muhîm e.

Ya din jî vê êrîşê qewet û potansiyela tevgera Kurd jî derxist ortê. Hetta ku guftûgoyên aştiyê de ev potansiyel jî nebe terefek li Rojhilata Navîn ne mumkun e.

Têkoşîn û berxwedan dom dike

Ji bo vê yekê rejîma hov ji betonê dîwarêr bilind ava kiriye, gundiyan bi temami diavêje van kampan.

Di meha Îlonê de dengên bomban, balafrî û tofan li Kurdistanê nehat birrîn. Balafrîrên dijmin, di 30'yê Tirmehê de êrîşî Hewlêrê (Erbîl) û di 31'an de jî êrîşî herêma Balîsan kirin.

Di 2'yê Tebaxê de li Mergasor, di 5'an de li Gele Reş, Kaniya Reş û Kaniya Sôr; di 27, 28 û 29'an de li Rewanduz, Şeqlewe, Zaxo, Amediyê, Şexan, Şîrvan û li Dihokê leşkerên rejîma Iraqê li dijî gelê Kurd êrîşên berfireh pêk anîn. Di encama (netîce) van êrîşan de bi sedan gund (bi tenê li dora Dihokê 200 gund) hatin wêrankirin.

Li gorî "Beyana Çapamenî" ya PDK-I, li herêma Amediyê ku di roja 5.9.1988 de hatiye derxistin, Şîrvanê şerekî dijwar di navbera leşkerên Iraq û pêşmergan de derket. Li herêma Zaxo û Dihokê leşkerên Iraqê hinekî pêşve çûn. Ji bo xelaskirina Kurdên sivil ku ji alî leşkerên Iraqî ve dor li wan hatibû girtin, di navbera pêşmergan û leşkerên Iraqê de şerekî dijwar derket. Li gora belavoka PDK-I, ji roja 19.7.1988'an heta 5.9.1988'an li herêma Behdînan 7 he-

zar leşkerên Iraqî hatin kuştin û birîndarkirin. Hêzên dijmin ku di vê demê de derbên herî giran xwarine ev in: Tûxayên 33, 38 û 45'an, Alaya 702 a ku ji leşkerên piyade hatiye damezrandin, Alayên xas ên 66 û 68, Alaya 2 a komando. Di vê navê de 4 helikopterên dijmin jî ji alî pêşmergan ve hatine xistin. Di van şeran de 250 pêşmerge û 1900 sivil (ji vana 1300 kes roja 28.8.1988'an) şehîd û 5000 kes jî, prranîya wan bi çekên kîmyayî birîndar bûn. Dîsa li gora belavoka PDK-I di 11'yê Îlonê de li herêma Amediyê şerekî mezin derket.

Li alî din, pêşmergên herêma Soran jî berxwedana xwe bi xurtî didomînin.

Di demek weha de serokê rejîma xwînrejî a Iraqê, Seddam Huseyin weka ku bixwaza durrûtiya xwe nişanî gelê Kurd û raya giştî a cihanê bide, efûyek giştî îlan kir. Armanca Seddam a yekemîn ev e ku raya giştî bixapîne. Û di vê nabênê de jî di bin xêliya efûyê de xwîna Kurdistan her biherikîne, Kurdistanê wêran bike. Armanca duyemîn jî, derxistina dubendiyekê di nav pêşmergan de ye.

Ev sextekariya wî neçû serî. Kesî guh nedayê, ji derewên wî bawer nekir.

X a ç e p i r s

1													
2													
3													
4													
5													
6													
7													
8													
9													
10													
11													
12													

mêr nekirî (berevajî) b) Navê perê Tirkîyê c) Kesê dilxweş, kamûran, bê derd.

Serejêr: 1-a) Cehenem b) Fêkiyek. 2-a) Ard b) Xweşik, xwînşîrîn, ezîz (berevajî) c) Jina ku ji malê tore bibe û biçe malbata xwe. 3-a) Li Kurdistanê Iraqê bi me'na "zewq", "kêf"ê têt bikaranîn b) Jin an qîza şîr didoşe. 4-a) Kar, şîxul b) Roja ku em niha têt de ne; Ne do û ne sibe c) Hişk. 5-Li Amerîka Navîn navê welatekî (berevajî). 6-a) Evrazî, ciyê ne rast û ne nişîv b) Paşa, qîral, hikumdar c) Kesên xerîb li bajaran bi pera lê radikevin; Mêvanxane. 7-a) Eşq, dildarî; hez jê kirin b) Bilindtirîn çiyayê li Kurdistanê. 8-a) Hîn bi wî alî de, hîn bi wir de (berevajî) b) Kurtiya "Doktor". 9-Qehremanê çîrokeke bi navûdeng a folklorî; Evîndarê "Xecê". 10-a) Beyraq, alem b) Ciyê ku meriv, heywan, tirimbêl li ser dimeşin c) Navê rojekê ji heftiyê. 11-a) Pronaveke bingehîn ji Kurmançiya jorî b) Rêving, rêwîngî; Kesê ji ciyekî diçe ciyekî din c) Qenc. 12-a) Bajarek li Kurdistanê Tirkîyê b) Kesê heywana serjê dîke û goştê wan difroşe (berevajî) c) Bi Kurmançiya jorî "teref", "alî".

Çeperast: 1-a) Kes, welat an dewleta ku axa meriv, welatê meriv dagirbîke, îşgal bike. b) Zeman, wext, çax. 2-a) Navekî kuran (berevajî), b) Heywana ducan, hemle c) Têlek ji porê meriv. 3-a) Tenayî, xweşî, wextê ku şer tunebe. 4-a) Li Behdînanê ji "şefeq", "berbang"ê re dibêjin b) Dijmin, ne dost, ne heval. 5-a) Birê dayika meriv b) Erd, xak c) sol (berevajî). 6-a) Karê seredane, çaxê ku meriv diçe seredana, ziyareta hevalan (berevajî) b) Bi Kurmançiya jorî "av" (berevajî). 7-a) Derketina geştê, çolê; her weha navê qîzan e b) Benê ku dikin stuyê dewaran, an barên li ser piştê dewaran pê dişidînin. 8-a) Dayik (berevajî) b) Li hinek ciyan ji "roj"ê re dibêjin (berevajî) c) Di Kurmançiya jorî de veqetandeka pirijmarê (berevajî). 9-a) Li Kurdistanê Iraqê ji "top" a listikê re dibêjin. 10-a) Ma'de-

neke pîrr buha û bi qîmet b) Kesê hewcedarê avê ye c) Navê darekê (berevajî). 11-a) Yek ji helbestvanên mezin ê Kurda ye. Di navbera salên 1868-1950 jî ya ye. Zimanê Erebi, Farişî, Tirkî û Kurdî baş dîzanî. Destpêka salên 1900 da li Stenbolê bûye endamê "Meclîs-el 'alî", sala 1909'an li Colemêrgê qeymeqamîti kiriyê û di sala 1918'an de li Silêmaniyê rêveberiya kiriyê. Dîwana helbestên wî li Kurdistanê Iraqê çap bûye. Helbesta "Newroz" bûye sirûd û pir bi nav û deng e. b) "Sola", "pêlawa" hespan. 12-a) Jina

Bersîva hejmara berê

Çeperast: 1-Mahabad, pîr, 2-Jez, zû, Aras, 3-ravekirin, ho, 4-bi, lawaz, 5-amade, 6-Sînem, vale, 7-qumrî, Êsa, 8-ag, lat, tî, ax, 9-nîşan, Avdel, 10-yên, aso, c) ran, 11-Kardox, 12-în, alav, ade
Serejêr: 1-Meryemxan, kî, 2-aza, giyan, 3-vîrnî, şêr, 4-beza, Îrlanda, 5-bûk, esman, ol, 6-li, tu, axa, 7-Dara, qe, 8-lawir, Îlon, 9-Panama, te, 10-sî, zava, derd, 11-sava, 12-Ehmedê Xanî.

Dinyayê dîktatoriya Seddam mahkûm kir

George Shultz bala hukûmeta Iraqê kişand.

Wezaretê Derva ya DAY jî li dijî êrîşa Iraqê û bikaranîba çekên kîmyayî li hember Kurdan nerazîbûna xwe anî ziman. Wezîrê Derva yê DAY G. Shultz li ser bûyarê, raya hukûmeta xwe diyar kir, got, "Divê em di biryara xwe de pîrr bi qîrar bin". G. Shultz di civîna bi berpirsyarê Karûbarê Derva yê Iraqê Wezîrê Edaletê Sadûn Hemmadî re got ku, "Li hember Kurdan bikaranîba çekên kîmyayî bi tu hawî meriv nikare bi heq nişan bide."

Ji Senatoya DAY daxwaza ambargoyayê li hember Iraqê

Ji aliyê din, Senatoya DAY biryar girt, 200 mîlyon dolarê ku wek qirêdiya îtxalat û îxracatê û 600 mîlyon dolarê ku wek qirêdiya zîreetê ku wê ji Iraqê re bê kirin divê bête sekinandin. Her wisa di qerarê de ji hemû nûnerên DAY yê di nav organîzasyonên malî ên navnetewî de ne têt xwestin ku ji bo sekinandina hemû alîkariyên bi Iraqê re dibin bixebitin. Li gel vê daxwazê, di biryara Senatoyê de daxwaza sekinandina îtxalata petrolê û yasaxkirina firotina her babet teknoloji jî têt kirin. Biryar ji R. Reagan jî daxwaz dîke

ku ew meselê bibe "Yekîtiya Miletan". Di biryarê de têt gotin ku, "Êrîşa Iraqê qirkirina miletêkî ye, her wisa ew, sûcekî ku qanûnên navnetewî yasax kiriye."

Xwediyê vê pêşniyarê, Senatorê Partiya Demokrat Cleuborne Pelle got: "Qet şik tune ye ku rejîma Seddam Husein ji bo ku gelşa (mesela) Kurdan jî ortê rake ev êrîş bir ser Kurdan."

Ji bo ku biryara Senatoyê bibe qerar divê ji qebûla Meclîsa Nûneran derbas be û Reagan îmze bike.

Iraq biryara Yekîtiya Miletan nas nake

Konseya Daimî ya Yekîtiya Miletan jî biryarek girt ku bi riya qomîsyonekê lêkolînê çê bike ku Iraqê li hember Kurdan çekên kîmyayî bi kar anîye ya na. Lê rejîma Iraqê ev pêşniyara Yekîtiya Miletan paş de veqerand û got: "Ji ber ku ev îddîa bê bingehe, em rê nadin ku tu lêkolîn çê bibe."

Li hember vê êrîşa Iraqê ku dixwaze Kurdistanê ji binde wêran bike welatên sosyalîst cardin wek mesala Helepçê bê deng man. Bê guman ev siyaset pîrr dewt e û di rojên pêşte wê hemû hêzên sosyalîst zirarek mezin jê bibînin.

Gel dersek baş da hukûmata Ozal

Bi vî awayî pêşniyara ku hilbijartin di 13'ê Çiriya Paşîn de çê bibe, nehat qebûl kirin.


Ev netîce wek şîrmaqekê li ruyê Ozal ket. Ya din jî, ev netîce wek partiyan burjuwazî dixwazin bidin diyarkirin, xurtbûna muxelefeta burjuwazî nade nişandan. Xelkê ev hilbijartin her çiqas jî bo helkirina pirs û problemên xwe wek riyekê nedidî jî, lê ji bo nerazîbûna xwe ya ji vê Hukûmetê bidin diyar kirin çûn ser sandoqan. Sedî 65'ê raya vê yekê nişan dide.

Sedî 35'ê dangan jî tev di mana piştigirîya pêşniyara Ozal nehatine bi karanîn. Qismek ji van, ji bo rojekê hîn zûtir ji serokê belediyên ANAP'ê xelas bibin, dengên xwe di gel pêşniyarê de, dan.

Wek hilbijartinên berê di vê hilbijartinê de jî, raya gelê Kurd li gorî Tirkîyê, hîn bêtir li dijî Hukûmata Ozal bû. Li Kurdistanê 69.4 prosent deng li dijî pêşniyara Ozal derket. Li Hekariyê ev 80.39 prosent, li Dêrsimê 79.76, li Diyarbekir 72.80, li Wanê jî 72.34 prosent bû. Li Tirkîyê ev 64.3 prosent bû.

Noxteyek balkêş, ê vê hilbijartinê ew e ku ji xelkê prosentek mezin, yan nêçûn ser sandoqan yan jî rayên vala avêtin. Ev reqem li Dêrsimê 34.6 prosent, li Ruhayê 17.6 prosent, li Diyarbekir 18.5 prosent bû. Ev yek bêtîbariya xelkê ji riyên ku burjuwazî dide pêş me, dide nişandan.

Tiştên ku hilbijartina parlamentoya Swêdê bi xwe re anî



Ingvar Carlsson, Seroka
Partiya Sosyal Demokrat




Carl Bildt, Seroka
Partiya Muhafazakar



Bengt Westerberg
Serokê Partiya Gel



Olof Johansson
Serokê Partiya Merkez



Lars Werner, Serokê
Partiya Komunist a Çep



Eva Boes, berpirsyarê
Partiya Hawîrdor

Di 18'ê meha Îlonê de li Swêdê hilbijartina parlamen-
toyê û belediyan çêbû. Ji
bilî VPK(Partiya Komûnîst
ya Çep) hemû partiyên din,
SAP(Partiya Karker a Sos-
yalîst-Partiya Sosyal De-
mokrat), Folk Partî(Partiya
Gel), Modarat(Partiya Kon-
servatîv) û Centern Partî
(Partiya Merkez) di hilbijar-
tinê de deng (ray) winda ki-
rin. Di parlemontoya Swêdê
de Partiya Sosyal Demokrat) 2,
Partiya Konservatîv 10,
Partiya gel 11, Partiya Cen-
tern 2 paralter winda ki-
rin. VPK 2 paralterên
din qezenc kirin û jimara
paralterên VPK bû 21.
Di vê hilbijartinê de par-

tiyeke nû kete paralteroya
Swêdê; Miljopartîet De
Grona (Partiya Hawîrdor ên
Kesk) 20 paralter derx-
ist.
Li gor netîca hilbijartinê
wê Sosyal demokrat kirday-
etiya xwe bi piştgiyariya VPK
bidomîne.
Tevî vê hilbijartinê, di
belediya Sjobo de hilbijarti-
nek din jî çêbû. Ev hilbijar-
tin li ser qebûlkirin an jî ne-
qebûlkirina biyaniyan bû.
%70 ji xelkê Sjobo ji bo
neqebûlkirina biyaniyan
deng dan. Bi vê netîcê jî ca-
ra yekemîn dijîtiya biyani-
an bi awakî resmî derkete
holê. Partiya ku li dijî
qebûlkirina biyaniyan xebat

kir û doza hilbijartina gel
kir, Partiya Center liqê Sjo-
bo bû. Herçiqas merkeza
Partiya Centern li dijî bira-
ra liqê xwe yê belediya Sjo-
bo derket û beyan kir ku ne
li gel wan e, lê tu tedbîreke
pratîk li dijî liqê belediya
Sjobo nestend. Ev bûyera
han ji bo Swêdê rûreşiyeye
û ji bo me biyaniyan ji
talûkek mezin e.
Nuha li hin belediyan din
jî kesên ku li dijî biyaniyan
in, bê tirs û êşkere dijîtiyê
dikin û bandrol û afîşên li
dijî biyaniyan li derûdora
bajarên xwe dixin. Li bajarê
Gîmo şîra "Eger Sjobo di-
kare, em jî dikarin" li gelek
ciyî hatiye nivîsandin. Hin

belediyan li herêma Skonê
(belediya Sjobo jî li vê her-
êmê ye) jî dixwazin li ser
bicîhkirina biyaniyan hilbi-
jartinê (referandumê) bikin.
Îhtîmalek pirr mezin e ku
ev pêla ha li hemû Swêdê
bela bibe û bingeha avakirin-
a partiyeye nijadperest bi-
afirîne. Nemaze dema nijad-
perestî di nav partiyek ku li
parlamentoyê tê temsîl ki-
rin, geş bibe û bi devekî
resmî derkeve holê talûke
mezintir dibe. Grûb û rêxist-
tinên nijadperest heya niha
ji hev belabûyî bûn. Lê îro
hêz û qewetên xwe digihînin
hev.
Hêvî ew e ku bûyera li
belediya Sjobo derseke baş

bide hukûmeta Swêdê û bi
taybetî jî biyaniyan li Swê-
dê. Li vê derê vatiniya herî
mezin li ser milên komele û
federasyonên biyaniyan e. Ji
niha pê ve divê komelên bi-
yaniyan giraniya xebatên
xwe bidin ser nasandina
çand û jiyana xwe. Divê ko-
melên biyaniyan doza infor-
masyonên bi rêkûpêk li ser
biyaniyan ji karbidestên hu-
kûmeta Swêdê bikin. Em
bawerin ku karbidestên hu-
kûmeta Swêdê pirsra nî-jad-
perestiyê hinekî sivik girt,
bi ser de neçû. Lê belê divê
em jî ji nû û pêve rûnin û
li ser bûyara Sjobo bipeyi-
vin, guftûgoyan bikin.
Bi taybetî em Kurd divê

ji hemû biyaniyan bêtir û
tekûztir xebatê bikin da ku
tesîrên hin bûyerên negatîv
peyda bûbin, ji holê rakin.
Navê Kurd û Kurdistanê bi
awekî baş, pozîtîv bidin na-
sandin. Di vî warî de Feder-
rasyonê Komelên Kurd li
Swêdê xebatek baş kir û
dike jî. Lê belê ev xebata bi
giranî li ba karbidestên
Swêdî tê krin. Kar û xebat
divê ji vê çerçevê derkeve û
berê xwe bide gelê Swêdî.
Komelên endamê Federasyo-
nê û yên ne endam di vî
warî de berpirsiyar in; nabe
ku mirov hemû tiştî ji Feder-
rasyonê bipê.
Hesen Mizgîn

Muxalefeta Gelê Şîlî Roj Bi Roj Xurttir Dibe

Van rojên dawî gelê Şîlî,
karkir, gundî û xwendevan
bi hev re mil bi mil, li dijî
diktatorê faşîst Pînoşet, tê-
koşîna xwe geş dikin. Di
destpêka meha Îlonê de nêzî
300.000 însan li payitexta
Şîliyê mitîngêk li dijî dik-
tatoriya faşîst pêk anîn.
Di 4'ê Îlona sala 1970'î
de, Eniya Gelerî (Unidad
Popular) bi serfiraziya hilbi-
jartinê gavekî avêt. Namzetê
serokomerê Eniya
Gelerî, Salvador Allende bû.
Di Eniya Gelerî de, ne tenê

Partiya Sosyalîst û Partiya
Komûnîst, lê partiyên din
ên çep jî hebûn.
S. Allende xwedî progra-
meke bi rêk û pêk bû. Ji bo
bicîhanîna programê piştgirî
ji gel hebû. Ji ber vê yekê jî
şirketa maden a sifir (baxir)
ji destê şirketên navnetewî
Kennecot û Anaconda yên
Amerîka derxist û kir malê
dewletê. Dewlemendiya bi-
nerd a herî girîng a Şîliyê
her sifir e. Şirketên Kenne-
cot û Anaconda hemû hati-
nên xwe derdixistin dervayî

Şîlî û di serde jî Şîlî roj bi
roj diket bin deyna. Helbet
Allende bi vê nema. Şirketa
bi nav û deng ITT jî kir
malê dewletê. Li ser vê yekê
Amerîka ji bo daxistina hu-
kûmeta Salvador Allende
her tişt kir. Şirketên trans-
portê hemû transporta hun-
dirê welêt dan rawestandin.
Lê belê dijmin bi serneket.
Di hilbijartina belediyan de
(Adar 1973) gelê Şîlî pişt-
giriya xwe carek din ji hu-
kûmeta gel re nîşan da.
Talûka derbeke eskerî ne

dûr bû. Dost û hevalên Sal-
vador Allende hertim bala
wî dikşandin. da ku tedbî-
rên xwe bistîne û gelê Şî-
liyê li dijî emperyalîzmê se-
ferber bike. Fîdel Castro di
dema ziyareta xwe ya sala
1972'an de bala S. Allende
kişandibû ser dijminan û
planên wan û daxwaz kiribû
ku ew, çekan bide destê kar-
kiran.
Bi rastî gotina F. Castro
derket û 11'ê Îlona 1973'an

di bin seroktiya Pînoşetê
faşîst darbeyek eskerî hat
çêkirin. S. Allende teslîm
nebû, bi merxasî xwe parast
û şehîd ket.
Ev 15 sal in ku gelê Şîli-
yê bê westan têkoşîna xwe
didomîne. Helbet gelê Şîli-
yê di vê têkoşîna xwe de te-
nê nema. Hemû hêzên de-
mokratîk piştgiyariya xwe ji
gelê Şîliyê re nîşan dan û
Pînoşetê faşîst mahkûm ki-
rin. Muxalefeta li dijî Pî-

noşet roj bi roj firehtir dibe.
Wisa bû ku mecbûr ma, ku
hin tawîzan bide. Ji bo ku
prestîja xwe ya kêmketî car-
din bilind bike biryara refer-
andumê derxist. Ku ji sindo-
qan bi pirranî "êrê" derkeve
wê Pînoşet heya sala 1998'-
an li ser hukum bimîne.
Hemû hêzên li dijî Pîno-
şet gihîştine hevdu; ji ko-
mînîstan heya dêran hemû
hêzan li hev kirine ku Pî-
noşet bixînin û ji bo vê
yekê jî propaganda "na" di-
kin. Lihevkirina van hêzan
tenê li ser xistina Pînoşet e.

Fîşa abonetiya Armancê

Salek **Abonetiya salekî**
 Şeş Meh 120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx:
 Nav û paşnav:
 Navnîşan:
 Welat:
 Postgiro: 50 37 99-9 Sweden
 Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya
 kvîtoya heqê abonetiye û fişê jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji
 me re bişînin.
 Adres: P.R S-172 06 Sundbyberg/Sweden



Salvador Allende, di destê de damançe di koşka parlamentoyê de li hem-
ber generalên faşîst serî natewîne, şer dike.